

## Nivîs, qada hestên polîtîk e

Nivîsandin gava ewil a ber bi azadiyê ve ye; ruhaniya hîs, vegotina ramana xwe naskirinê ye. Nivîsandin serêşandin, tekûzkirina kesayet û mezinkirina hestan e. Nivîs, qada hestên polîtîk e. Bi nivîsê re lêgerînên kûr, xeml û xêla kedê... ***Adar Şaman / R.2***



## Derfetên zimên û vegotina wêjeyî

Ziman wêneyê hişê mirov nîşan dide. Mirov dinyayê li cem xwe çawa bisewirîne, tiştan û alav û bûyer û kesan çawa binirxîne, şopa vê şiyana wî ya dîtin û nirxandin an têgihîştina tiştan jî xwe di zimanê wî re dide der... ***Îbrahîm Seydo Aydogan / R.5***



## Gera li Edaletê Azadî ye

Di êş, jan û xemên wê de dengek heye. Di awirên çavên wê de hêrsek heye. Di nalîn û lorînê wê de hêviyek heye. Di sekna wê de serbilindiyek heye. Di mistên destê wê de axînek heye. Di rondikên çavên wê de, li dijî... ***Leyla Lorîn / R.2***


# xwebûn

25-31 COTMEH 2021 HEJMAR: 97 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


## Faşîzm hêzê cinîyan ra terseno



Dîna de kotî beno bibo, wayîrê kamci ziwan, îtîqat, netew bibê, duwel onca ki heqa cinî ci nêdena. Kamcî welat de niyadîme, uca de cinîyan ser zorvajîye esta. Duwele ke xo bi demokrasîye name kenê înan de kî seba cinîyan qeraran oncîna en zêde camêrdî danê. Hema beno ke vajîme dîna de jê kurdan canikî çin ê ke hem binê zilm zorvajîya girane der ê hem kî duştê naye de xoverdayîşêdo girs danê... ***Meral Kuçuk / R.9***

## YE: Tirkiye hêzeke dagirker e

Komîsyona Yekitiya Ewropayê (YE), Rapora Pêşvebirina Tirkiyeyê di 20'ê cotmehê de aşkera kir. YE'yê di rapora salane ya Komîsyona Yekitiya Ewropayê ku li ser welatan amade kir de, Tirkiye cara yekem li Sûriyeyê weke "hêzeke dagirker" pênase kir. YE'yê di raporê de rexneyên giran li Tirkiyeyê kir û diyar kir ku polîtîkaya... ***R.3***

# Durûtiya dewletan a li dijî kurdan

Tirkiye êrîşên xwe yên ku di 23'yê nîsanê de li başûrê Kurdistanê dabû destpêkirin bi çekên kîmyewî didomîne. Di êrîşên hewayî yên 3 mehên dawîn de bi dehan endamên HPG'ê jiyana xwe ji dest dan. Lê cîhan li dijî sûcê mirovahiyê û çekên kîmyewî bêdeng e. Li gel bangên rewşenbîr û siyasetmedaran jî rêxistinên navdewletî û NY'yê bêdeng in. ***R.7***




Tu bi qurbana zarokên xelkê bî ***Macid Yusif / R.10***




## Dema dilopa dawî di sere re avêt û bû lehî

Gelo wê heya kengî ev êrîşên dagirkeriyê yên dijmirovî dewam bikin? Dema ez vê yekê ji xwe dipirsim, di serî de fikra min diçe qada şer. Pişt re diçe cem dayikên ku dilê wan disoj e. Em roj bi roj bang û hawara dayikan dibînin û dibihîsin. Roj bi roj wan nûçeyan dixwînin û parve dikin. Ji serê vê mehê ve li deriyê sînor ê Sêmalkayê di serî de dayik, malbatên cangoriyan ji bo cenazeyên zarokên xwe di çalakiyê de ne. Çiqas trajîk e ne wisa? Destpêkê bi hovane êrîş dikin, şehîd dixin û bi ser de jî îşkencê li malbatan dikin. Ev rêbaza dewleta tirk e. Ji ber ku di hovîtiya xwe de tu sînoran nas nake. PDK jî xeta dijmin dişopîne û bi heman rêbazî êrîşî gelê kurd dike... ***Eylem Şoreş / R.6***

## Jiyana li dijî heqîqetê înkara jiyanê ye

Di nav gerdûnê de teşeyeke jiyana hemû cureyên zindiyan heye. Teşeya jiyanê 'xwebûn'a wî/wê zindîbûyînê diyar dike. Ji ber wê, ji bo her cure zindî teşeya jiyanê dibe heqîqeta wî/wê zindîbûyînê. Çi qasî li gor wê teşeyê tevbigere ewqasî heqîqeta xwe pêk tîne. Heqîqet, cewher e. Di gerdûnê de her tiştek destpêkeke wî/wê heye. Ji bo zindîbûyînê jî destpêk dibe heqîqeta wan. An jî mirov dikare heqîqetê wekî pêkanîna li gor pêdiviyên jiyanê bi nav bike. Çiqas li gor pêdiviyê teşeya jiyana xwe tevbigere ewqasî heqîqeta xwe ava dike. Nejiyana li gor heqîqeta xwe, înkara jiyanê ye. Di nav fezayê de çend... ***Salîh Keleş / R.8***



## Kirasekî kurdî li têgehan dike

Di mijara fikrandin û bingeha fikrînê de her çiqas ku li ser axa qedîm, kurd xwedî bingeheke xurt bin jî ev bingeh wek felsefeyeke bi rêk û pêk û nivîskî derneketiye pêşiya me. Îro li çar parçeyên Kurdistanê (her çiqas ku hin ceribandinên li ser çavkaniyên felsefeya cîhanê hebin jî kêm in) kurd ji bo felsefe, feylesof û têgehên felsefeyê çavkaniyên ji zimanê erebî, farisî û tirkî dixwînin... ***Hevpeyvîn / Bêrîvan Kayi / R.4***



## Kurdên cîhana dêrîn; Hattî 8

....Qasid Hattûşazîtî, bi nameyeke gilîbarkirî ya ji hêla Keybanû Ankhesenemon ve hatibû şandin, vedigere. Keybanû, di nameya duyem de hinekî îşkê gazinên xwe dijdîne û ji Keya Şûppîlûlîûma re... ***Agît Yazar / R.12***

## Vîrê kurdan û pêşengehê Guneştekînî

Yew hewte over Amed de pêşengehê Ahmet Guneştekînî ê bi nameyê 'Odaya Vîrî' ame akerdin. No pêşengeh heta name, naverok û şexsîyetê ke tewrê ci bîyî zaf ame rexnekerdin. Naverokê nê rexneyan de tewr zêde nizdîbîyayîşê dej û vîrî ê kurdan est bî û rexneyî zî zaf ca de bî. Heta enka zaf tenê ke qet alakaya înan bi dej û vîrê kurdan çinî bi qalî kerdî, la belê fikir û rexneyê şarê kurdî no pêvajoyî de bi sîstematîk nêameyî nuştin. Ez no nuşteyê xo de hewl bida nê rexneyan bi hewayêko sîstematîk raya pêroyên reyde par bikera. Ahmet Guneştekîn sey yew hunermendêk kurd yeno şinasnayîş. Heta enka beşa wêneyî de kar û xebatan kerdo. Nê seranê peyênan de bi yew hewa tekîlîya ci bi Tirkî-Sipîyan reyde vêşî bî. Ahmet Guneştekîn 23ê nîsana... ***Mahîr Uzmez / R.9***

# Gera li Edaletê Azadî ye



Leyla Lorîn

Di êş, jan û xemên wê de dengek heye. Di awirên çavên wê de hirsek heye. Di nalîn û lorînê wê de hêviyek heye. Di sekna wê de serbilindiyek heye. Di mistên destê wê de axînek heye. Di rondikên çavên wê de, li dijî zilmê rastiyek heye. Ji bo edaletê, di hemû çalakiyên wê de, azadî û mafperwerî heye. Ev dayik Emîne Şenyaşar e…

Ev zêdetirîn 230 roj in dayik Emîne şanyaşar bi tevî lawê xwe ji bo edaletê li dijî reşkûjî û komkujiya ji aliyê parazvan û xizmên parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl ve li ser malbata wan hatî kirin, li ber Edliyeya Rihayê, li dijî mêrê paşverû, bêhiqûqiya dewleta tirk, di nobeda edaletê de ne. Dayik Emîne Şenyaşer ev zêdetirîn 230 roj in li hemberî zilma dewleta tirk, ji bo edaletê bi wêrekî li ber xwe dide. Lê hîn jî ji bo çalakiya dayik Emîne Şenyaşar û malbata wê bersivek nîne. Daraza Tirkiyeyê bêdeng e. Saziyên girêdayî mafên mirovan ên Ewropayê ku qaşo dibêjin em edaletperest in; lê bêdengiya xwe hîn jî diparêzin. Rêxistinên navneteweyî û mirovî jî bêdeng in. Edalet, dadgehên mafên mirovan, hiqûq, ji bo sûc û kiryarên li ser kurdan, hemû di nava bê dengiyekê de li hemberî bêhiqûqiya heyî, çavên xwe girtine…

Li Tirkiyeyê dema mijar dibe kurd û sûc û kiryarên li ser kurdan, ma mimkun e ku mirov qala azadiyê û edaletê bike? Bêhiqûqiyeke mezin di vê rastiyê de li ser mafên kurdan tê kirin. Ango li kê derê kurdek bê kuştin, li gorî zagon û edeleta dewleta tirk, li wê derê, edalet û ji bo mafperweriya xwe serkeftinek mezin dibînin. Ji bo dewleta tirk, kurdên herî baş kurdên mirî ne. Jixwe hêzên dewletên zirhêz jî di vê mijarê de, zagonên dewleta tirk mafdar dibînin. Heta dawiyê ji bo qirkirin û tevkujiya kurdan destek didin. Jixwe zagon û edaleta dewleta tirk, ji bo kurdan, tune û qir bikin hat avakirin. Rastiya hiqûq û edaleta dewleta tirk, bi xwîna kurdan hatiye nivîsandin…

Ew hiqûqa ku xwe dispêre dîroka dewlata zalim û desthilat, ma dê çawa bikaribe êşa dayik Emîne û malbata wê bibîne û kujeran bi mafperwerî dadgeh bike, teslîmî edaletê bike. Gelo ma ne ew hiqûq e, bi çêbûna dewletê ve nirxên dayikê berevajî kir û bi şer û talanên mezin, li ser civakan pêk anîn û heta niha bi pergala xwe ya mirovkuj, tevkujî, çandkujî, edaletkujî li ser civaka jin, bêhiqûqiyê û bêedaletiyê didomîne…

Çalakiya 'Nobeda Edaletê' ya dayik Emîne Şenyaşar a ku hevjîn û du lawên wê di 14'ê Hezîrana 2018'an de ji aliyê parazvan û xizmên parlamenterê AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz ve li navçeya Pirsûs a Rihayê hatin qetilkirin û kurê wê Ferît Şenyaşar ê ji êrîşê bi birîndarî rizgar bû, ji 9'ê adarê ve li ber Edliya Rihayê nobeda wan hîn jî didome…

Gera li edaletê ya dayik Emîne Şenyaşar hêviya azadiyê ye û edalet bi xwe ye. Di têkoşîn û gera edaletê ya dayik Emîne Şanyaşar de nirxên civaka jinan li ber xwe dide. Nirxên dîroka berî mîladê ya 12 hezar salan ku bi destê dayikê, ji bo mirovahiyê, jiyan afirand, li ber xwe dide. Civakbûn, exlaq, çand, mirovbûn, hest, hêvî, hezkirin, berxwedana jinan a li dijî zilmê, li ber xwe dide. Berxwedana jinên kurd, di şexsê dayik Emîne Şenyaşar de bêyî ku xwe bispêre çi zagonên dewletê, ji bo azadiyê gihaye edaletê…

Dîmen û wêneyên dayik Emîne Şenyaşar her çiqasê êş û xeman li ser êşên jinan û dayikên berxwedêr zêde bike jî lê çalakiya dayik Emîne Şanyaşar, mafdar e û sembola edaletê ye. Ew qasê jî hêza edaletê û hêviya azadiyê xurt dike. Çalakiya dayik Emîne Şenyaşar li kêleka berxwedana jinên kurd, hesap ji kujerên jinan jî dixwaze, di berxwedana çalakiya dayik Emîne Şanyaşar de têkoşîna jinan a li dijî tundiyê jî mezin dibe. Berxwedana dayik Emîne Şenyaşar ne bi tenê ye. Têkoşîn û berxwedana jinên kurd ku di her qadên têkoşînê de li hemberî zilma dewletê û mêrê kujer ku ji zaliman hesap dipirse; li pişta çalakiya dayik Emîne Şenyaşar e. Lewre êş û jana dayik Emîne Şenyaşar, êşa hemû jinan e ku li maf û azadiya xwe digerin.




# Nivîs, qada hestên polîtîk e



Adar Şaman

Nivîsandin gava ewil a ber bi azadiyê ve ye; ruhaniya hîs, vegotina ramana xwe nasîniyê ye. Nivîsandin serêşandin, tekûzkirina kesayet û mezinkirina hest e. Nivîs, qada hestên polîtîk e. Bi nivîsê re lêgerînên kûr, xeml û xêla kedê, barîna xeyalên hestan û girêdana bi jiyana azad re bi teşe dibe. Zeman, diyalektîka mejî bi gotinê resen dike…

Kes, bi hîskirina hestên xwe re tevî pênûsa xwe diherike; fikra xwe tevî herikîna jiyana xwe dike. Bi hestên xwe siberojê ronî dike. Yanî pênûsa jinan, temsîla gotina wan dike. Yek ji amûrên têkoşîna jinan ên herî karîger qada ramanê ya wêjeyê ye. Ramangiha jinan, ji pênûsa pirtûkên wê pêk tên. Di rêveçûna şoreşa jinan de, mertala her jineke ku ji bo azadiya xwe têdikoşe, pênûsa xwe ye. Bêguman ev rê ber bi şoreşê ve dirêj dibe, hîn tiştên ku bêne nivîsandin û vegotin gelek in. Weke hemû beşên zanistên civakê çawa ku di bin serweriya desthilatdariyê de bi rizîbûnê re rû bi rû mane; di qada wêje-ramanê de jî ya li pêş diyar dibe fikra nêr e. Hevoka nêr, çima ew çendî balê dikişîne ser xwe? Encam, hişmendiya çors e. Gotin, ji estetîzekirina  xweşikbûna ruh qut e.

Sedema ku fikrandina yekalî li pêş e, ev yek jî bandora neyênî li ser hizrandina qada wêje/ramana kurdî jî dike. Wêjeya kurdî, di hêla hişmendiyê de hîn di asta paradigmaya neteweya/demokratîk de xwe bi rêk û pêk nekiriye. Bersiva ramyariyê bi gotegotên nêr/mêr digere. Ev hişmendî li hember wekheviya di navbera jin û mêr de bi erka dijber tevdigere. Newekheviya di navbera zayendan de, encamên vê zihniyeta feodal in.

Dema ku ez nanivîsim, xwe li hemberî hizra jinan kêm dihesibînim. Nivîsandin hizra min aram dike. Qelsî ne ji gotinê, lê ji ponijandina kêm a pênaseya wêjeyê tê. Orjîna zimanê kurdî ji çanda xwezayî ya mak/mêbûnê tê. Ji bandora şaristaniya navendî bêhtir bi pêşketina şoreşa çandiniyê re li erdîngeriyek fireh berbelav dibe. Lê bi demê re forma qalikê nêr lê tê alandin… Aqlê hevoksaziya wêjêya kurdî ji rêya ber bi şoreşa jinan ve diçe, dûr dimeşe. Mêr xwe kiriye navenda wêje/ramanê. Lewma eywana wêjeyê weke ku milkê mêr ê xas be tê dîtin.

Meriv bi nivîsê dikare rêya diçe heqîqetê nîşan bide; rastiyên sernixumandî aşkera bike. Jin dikare tevî pênûsa xwe êş, pirsgirekên jin dijîn, êrîşên li dijî jinan tên kirin rave bike. Her wiha behsa destkeftiyên di armanca têkoşînê de hatine afrandin vebêje. Çima pêwist e jin hîn bêhtir bixwînin, binivîsin, niqaş bikin û xwe di rêya kedê de pêş bixin? Ji ber ku nivîsandin hesta nîmetê ya mirov bilind dike. Hemin heye ku wê merdiya di warê raman/nivîsê de hiş rengîn bike. Çerxa di navbera mejî û pênûsê de dizivire, ew e ya ku ramangeha bîra mirov dikole bixwe ye. Dawiya dawîn de wê çerxa ramangeha meriv, biniqute hêlîna hizrandina hestan…



Yek ji van hêlînên ku em dilê xwe lê vedikin/parve dikin û malavaniyê ji hest, ramangeha me re dike jî Rojnameya XWEBÛN'ê ye. Bila di dema weşana nû de bala we, hiş û çavên we her li ser Rojnameya XWEBÛN'Ê be. Ji bo şopandina geşedanên li Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê bila çavkaniya we ya sereke rojnameya Xwebûnê be! Rojnameya Xwebûnê; bîra zimanê zikmakî, dibistana dîrokî, pirtûkxaneya çanda kurdewar, bi zimanê me yê dayikê qala rastiyên di tarîtiyê de veşartine dike. Gelî hevalan; hûn di rojên bê de amade ne ku em bi hev re tûrikê xwe bi peyvên ramangeha Rojnameya XWEBÛN'ê zengîn bikin? De bila, em ê bi hev re Rojnameya XWEBÛN'ê bixwînin…

## Li Ûrmiyeyê girtiyên jin serî hildan



Li Girtîgeha Ûrmiyeyê ya rojhilatê Kurdistanê girtiyên jin li dijî zext û îşkeceyê di grevê de ne. Li gorî agahiyan, rêveberiya girtîgehê bi zorê li jinan ferz kiriye ku tev li qûrsên îdareyê bibin. Girtiyên ku vê qebûl nekirin, rastî gefan hatin. Girtiyan jî li dijî van zextan betanî şewitandin û serî hildan. Hat ragihandin ku wezîfedarên Îranê, girtiyên ku serî hildan xistin hucreyan, îşkence li wan kirine. Her wiha girtiyên jin bi rêya malbatên xwe bang li raya giştî kirin. ***ÛRMIYE***

## Pêşenga lorikbêjiya Îranê koça dawî kir



Pervîn Behmenî yek ji tirkên Îranê ku wek hunermend, mamoste û çêkera lorîkê dihat nasîn, di 72 saliya xwe de ji ber pirsgirêkên dil û pişikê koça dawî kir. Bêyî ku bibêje çi fars çi tirk û çi kurd e dengê xwe bi hemû Îranê daye hîskirin û bi lorîkên xwe bûbû reşika çavên zarokan. Her wiha li Tehranê ji hêla hevalên wê ve ji bo hezkirinên xwe yên li hemberê xebata wê nîşan bidin bîranînek lidarxistin. ***TEHRAN***

## Divê Iraq Wezareta Jinan qebûl bike



Di hilbijartinên pêşwext ên Iraqê de ku 10'ê cotmehê pêk hat, jinan sînorê kotayê derbas kir û 97 jin bûn parlamenter. Sînorê kotayê ji bo jinan 83 kursî bûn. Parlamentera Berê ya Iraqê Rêzan Şêx Dilêr bi daxuyaniyekê,  ji ber serkeftina jinan a di hilbijartinên pêşwext de, xwest di nava hikûmeta Iraqê de Wezareta Jinan pêk were û got ku ji ber serkeftina jinan a di hilbijartinê mafeke asayî ye. Dilêr diyar kir ku divê jin bibin wezîr û got ku ji bo vê rolê jinên jêhatî û serkeftî hene. ***BEXDA***

# YE: Tirkiye hêzeke dagirker e

Komîsyona Yekitiya Ewropayê di rapora xwe ya salane de cara yekem dewleta Tirkiyeyê li Sûriyeyê weke 'hêzeke dagirker' binav kir

Navenda Nûçeyan



Komîsyona Yekitiya Ewropayê (YE), Rapora Pêşvebirina Tirkiyeyê di 20'ê cotmehê de aşkera kir. YE'yê di rapora salane ya Komîsyona Yekitiya Ewropayê ku li ser welatan amade kir de, Tirkiye cara yekem li Sûriyeyê weke "hêzeke dagirker" pênase kir. YE'yê di raporê de rexneyên giran li Tirkiyeyê kir û diyar kir ku polîtîkaya derve ya dawî ya Tirkiyeyê ne li gorî pêşîlêgirtinên ewlehî û polîtîkaya derve ya YE'yê ye.

YE'yê di raporê de ragihand ku armanca Tirkiyeyê ya 'Sûriyeyeke bi îstiqrar û dewlemend' jî ji hêla YE'yê ve hatiye parvekirin û wiha got: "Tirkiye beranberî vê yekê hemleya xwe ya leşkerî ya li bakurê Sûriyeyê bi beşdarbûna milîsên ku piştgiriya wê dikin, didomîne. Tirkiyeyê torên xwe yên binesaziyê li bakurê Sûriyeyê zêde kirin û pêşkêşkirina xizmetên bingehîn zêde kir."

YE'yê di raporê de diyar kir ku rewşa mafên mirovan a li herêmên di bin kontrola leşkerên tirk û hêzên çekdar ên ser bi Tirkiyeyê ve hê jî cihê fikaran e û got: "Rayedarên tirk piştgiriya çalakiyên ku ji aliyê hikûmeta demkî ya Sûriyeyê ve ji bo vegerandina aramiyê û avakirina avahiyên îdarî li ser erdê pêk tên, kirin. Tevî hemû hewldanan jî divê Tirkiye weke hêzeke dagirker li ser pirsgirêka mafên mirovan raweste."

Balkêş e ku di rapora her sal tê weşandin de ji bo Tirkiyeya li Sûriyeyê dimîne, pênasekirina "hêzeke dagirker" ku beriya niha nehatibû gotin, hat kirin.

# Înîsiyatîfa Piştevaniya Girtiyan êdî li qadan in

Înîsiyatîfa Piştevaniya bi Girtiyan re, li Şaxa Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Stenbolê plana çalakiya 2 mehan aşkere kir. Înîsiyatîfê li eywanê pankarta "Ji cezabirînê re bes e. Bila girtiyên nexweş bêne berdan!" vekirin.

Parlamenterê HDP'ê Mûsa Pîroglu di daxuyaniyê de axivî û diyar kir ku li girtîgehan pêkanînên keyfî diqewimin û dixwazin vîna girtiyan bişkînin. Li ser navê Înîsiyatîfê jî Erkan Çita daxuyanî xwend û destnîşan kir ku 2 sal in bi hinceta pandemiyê hemû cûreyên danûstendina girtiyan bi derve re hatiye qutdkirin û wiha got: "Tecrîda li ser girtiyan mîna berê hatiye kûrkirin. Bi rêya lijneyên çavdêriyê 'poşmanî' li girtiyan tê ferzkirin. Ji bo berdana girtiyên polîtîk werin betalkirin, hêcetan diafirînin. Lêpirsînên disîplînê yên ji bo govend gerandinê, stranbêjiyê hatin vekirin. Her cure zext, tecrîd, îşkence li girtîgehan heye. "

**6 salên dawî zêdeyî 103 girtî mirin**

Çita anî ziman ku rewşa girtiyên nexweş xirabtir bûye û wiha got: "Bi dehan girtiyên nexweş li girtîgehan dimirin an jî piştî ku tên berdan di demek kurt de dimirin. Ji ber ku raporên 'nikarin di girtîgehê de bimînin' nadin wan nayên berdan û mirî ji girtîgehan derdikevin. Di 6 salên dawî de, herî kêm 103 girtiyên ku 'mafê xatirxwestinê' jî nedane wan, li girtîgehê jiyana xwe ji dest dane. Gelek girtiyên neweş nayên dermankirin."




**Dê heta 19'ê kanunê li qadan bin**

Çita herî dawî bang li raya giştî kir û wiha got: "Em dixwazin her kes destekê bide vê çalakiyê. Wê çalakiyên me heta 19'ê kanunê bidomin. Di nav du mehan de, em ê serdanên ji bo rêxistinên sivîl û malbatên girtiyên ku berdana wan tên betalkirin bikin. Wê li ser mijarên wekî tecrîd û binpêkirina mafan daxuyaniyên çapemeniyê bên dayîn. Weke Înîsiyatîfa Piştevaniya bi Girtiyan re, em bi vê yekê radigihînin ku em ê li her qadê û her kêliyê bêjin 'dawî li betalkirina înfazan bînin û bila girtiyên nexweş werin berdan'. Em vê bernameya xwe bi raya giştî re parve dikin." ***STENBOL***

# Li Tirkiyeyê ked erzan, xizanî zêde dibe

Li gorî daneyên DÎSK-AR'ê li Tirkiyeyê 7 milyon û 855 kes betal in. Li gorî raporên DÎSK-AR'ê di nava 18 salên hikûmeta AKP'ê de sînorê birçîbûnê 6.3 qat zêde bûye. Sînorê xizaniyê jî 10 hezar lira ye.

Li gorî rapora Navenda Lêkolînê ya Konfedarasyona Sendîkayên Karkerên Şoreşger (DÎSK-AR) ya bi navê "Bêkarî û Îstihdamê" hejmara bêkaran 7 milyon û 855 kes in. Li gorî raporan li Tirkiyeyê di 18 salên dawî yên serdema AKP'ê de sînorê birçîbûnê 6.3 qat zêde bûye. Sînorê xizaniyê ya 4 kesan 10 hezar lira ye. Sînorê birçîbûnê li Stenbolê 3 hezar û 100 lîra û li Enqereyê jî 2 hezar û 871 lîra ye.

Li gorî daneyên Yekîneya Ar-Ge ya Konfederasyona Kamu-Îş a Yekbûyî (KAMU-AR) jî sînorê birçîbûnê ya 4 kesan 3 hezar û 589 lîra û sînorê xizaniyê jî 12 hezar û 397 lîra ye.

Li gorî rapora KAMU-AR'ê bihayê zexîreyan (xurekan) ji tebaxa 2020'î heta tebaxa 2021'ê ji sedî 39.8 zêde bû ye.

Li gorî vê raporê ji tebaxa 2020'î heta tebaxa 2021'ê bihayê nan, savar, arvan û maqarnayê ji sedî 28,4, bihayê goşt û masiyan ji sedî 22,7, bihayê şîr û berhemên şîr û hêkan ji sedî 35,7 zêde bû ye. Bihayê rûn ji sedî 56,9 bihayê fêkiyan ji sedî 68,8, bihayê zerzewatan ji sedî 81,7 zêde bû ye. Bihayê nok, nîsk û fasûleyan jî ji sedî 29,2 zêde bû. Bihayên zexîreyan di zik hev de di 12 mehan de ji sedî 31,9 zêde bû.

Li gorî daneyên TUÎK'ê jî bihayê zexîreyan ji sedî 28,79 zêde bû

Bi taybetî xurekên sereke yên ku divê li mala her malbatê hebe bi rêjeyek mezin biha bûne. Li gorî daneyên esnafên marketan yên li Amedê bihayê zexîreyan hinek jê ji sedî sed û hinek jî ji sedî 50 zêde bûne. Bihayê çend cûreyên xurekan yên sala par û îsal nîşan dide ku qeyrana aborî çiqas kûr e. Sala par bihayê qutiya salçeya firingiyan a 4300 gr bi 28-30 lîra bû, îsal derketiye 55 lîrayan. Bihayê qutiya rûn ê 5 lt sala par 40-50 lîra bû, îsal derketiye 80-90 lîrayî. Bihayê 10 kîlo matîkê bi 30 lîra bû îsal derketiye 85 lîrayî. 5 kîlo nokên ku sala par bi 22-25 lîra bûn, îsal derketiye 55-60 lîrayî. 5 kîlo savara ku sala par bi 15 lîra bû îsal derketiye 30 lîrayî. Kîloya şekir ji 5 lîra derketiye 8 lîrayan. Torbeyê sabûnê yê 4 kîlo ji 30 lîrayî derketiye 55 lîrayan. Koliya hêkan ku sala par bi 20 lîra bû îsal derketiye 30 lîrayî. Şûşa rîçalê ya 1700 gr sala par 12-13 lîra bû, îsal derketiye 27-28 lîrayî.

Di rewşeke wisa de mirovên betal û heqê herî kêm distînin ji bo amadekariya qûtê/zexîreya demsala zivistanê kûr difikirn. Lê rayedarên hikûmeta AKP'ê diyar dikin ku qeyrana aborî tune ye. ***AMED***

## 64 jinên rewşenbîr banga lêkolînê kirin

64 jinên siyasetmedar, rewşenbîr û çalakvan yên cîhanê li dijî bikaranîna çekên kîmyewî ên Tirkiyeyê name ji Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) re şandin. Jinan di nameyê de xwestin ku ji ber sûcê hatiye kirin hesab ji Tirkiyeyê bipirsin.

Gelek jin ku di nav de Silvîa Federîcî, Nancy Fraser û Sylvîa Marcos jî hene bang li Serokê OPCW'ê kirin ku li dijî êrîşên çekên kîmyewî yên Tirkiyeyê têkevin nava tevgerê.

Bi hewldana Rêxirawî Peywendiyê Derwe ya Jinên Kurd (REPAK) ji çar aliyên cîhanê 64 jin û rêxistinan nameyek nivîsîn û xwestin ku OPCW berpirsyariya xwe bi cih bîne û li dijî bikaranîna çekên kîmyewî ya TSK'ê lêpirsînê bidin destpêkirin. Jinan destnîşan kirin ku mehên dawî artêşê 138 caran bi çekên kîmyewî êrîş kiriye û ji ber vê gelek şervanên HPG'ê jiyana xwe ji dest dane. Tirkiyeyê di 17'ê cotmeha 2019'an li dijî bajarê Serêkaniyê di êrîşa hewayî de fosfora spî avêt. Ji ber vê êrîşê jin û zarok jî di nav de bi dehan kes bi giranî birîndar bûn. Mixabin wê demê saziyên navneteweyî û dewlet li ber sûcên Tirkiyê bêdeng mane.

Jinan di dawiya nameyê de xwest hesab ji Tirkiyeyê bipirsin.



## Rêxistinên rojavayî: Ji Tirkiyeyê hesab bixwazin

Saziyên sivîl û hiqûqî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, êrîşên SÎHA ên Tirkiyeyê ku li dijî Kobanê pêk anîn û 2 sivîl qetil kirin û 3 sivîl jî birîndar kirin, şermezar kir. Nûnerên saziyan bang li hêzên navdewletî kirin û xwestin hesab ji Tirkiyeyê bixwazin. Nûnerên rêxistinên civakî li Minbic, Qamişlo, Şehba, Tebqa, Reqqa û Helebê çalakiyên girseyî li dar xistin.

Li Minbicê Kombûna Jinên Zenûbiya, êrîşa Tirkiye ya li dijî Kobanê bi daxuyaniyekê şermezar kir. Meclisa Edaleta Civakî û Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê jî bi heman armancê daxuyanî da. Meclisa Edaleta Civakî ya Efrînê jî bêdengiya herêmî û navneteweyî ya li hember sûcên hikumeta AKP'ê ya li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne, şermezar kir. Dîwana Edaleta Civakî li Tebqayê jî daxuyanî da. Hevserokê Edaleta Civakî Mûtez El-Sûdan anî ziman ku ev êrîş hemwextî salvegera duyemîn a dagirkirina bajarên Serêkaniyê û Girê Spî pêk hat.

**Erka xwe pêk bînin**

Meclisa Edaleta Civakî li Reqayê jî daxuyanî da. Dîwana Edaleta Civakî li Helebê jî bi heman armancê daxuyanî da. Dîwana Edaleta Civakî li li taxa Şêx Meqsûd daxuyanî da. Hevserokê Yekitiya Parêzeran parêzer Mihemed Emîn anî ziman ku ew Neteweyên Yekbûyî (NY) û Meclisa Ewlehiyê ya NY'ê ji parastina sivîlan berpirsyar dibînin û xwest berpirsyarî û erkên xwe yên li hemberî dewletên endamên civaka navneteweyî bi cih bînin. ***QAMIŞLO***

## TERZ Û AWAYÊ JIYANA KURDAN BI SERÊ XWE FELSEFEYEK E

# Kirasekî kurdî li têgehan dike

■ Bêrîvan Kayi

*Di mijara fikrandin û bingeha fikrînê de her çiqas ku li ser axa qedîm, kurd xwedî bingeheke xurt bin jî ev bingeh wek felsefeyeke bi rêk û pêk û nivîskî derneketiye pêşiya me. Îro li çar parçeyên Kurdistanê (her çiqas ku hin ceribandinên li ser çavkaniyên felsefeya cîhanê hebin jî kêm in) kurd ji bo felsefe, feylesof û têgehên felsefeyê çavkaniyên ji zimanê erebî, farisî û tirkî dixwînin. Di van salên dawî de gelek nivîskar êdî berê xwe didin xebatên li ser felsefeyê û her diçe hejmara van kesan jî zêdetir dibin.*

**Tu ji beşa sosyolojiyê mezûn bûyî lê te berê xwe da felsefeyê; hem jî beşeke ku têgehên felsefeyê zêde di kurdî de nehatine nîqaşkirin! Te gelek pirtûkên felsefeyê yên wek 'Dengê Felsefeyê', 'Rêwîtiyeke Zanistî', 'Destpêka Felsefeyê', 'Antolojiya Feylesofan' û hwd. derxistin. Tu dikarî qala zor û zehmetiyên vê rêwîtiya xwe bikî?**

Belê, rast e. Lê dikarim bibêjim ku meyla min li ser felsefeyê jî zahf bû û mamosteyên dersên me yên felsefeyê jî felsefenasên serkeftî bûn. Rehmetiyê Kurşat Bumîn yek ji wan kesan bû ku felsefeyê zêdetir bi min daye hezkirin. Dîsa Prof. Ahmet Arslan jî bi heman awayî. Dema meriv ji rojavayê cîhanê mêze dike, meriv dibîne ku gelek civaknas, di heman demê de felsefenas yan jî em bibêjin feylesof in. Jixwe ji ber têkiliya felsefe û zanistên civakî, ez vê yekê xerîb nabînim. Ji ber ku mirovên têgihiştî dizanin ku felsefe jî wekî huner, zanist, wêje û hwd. parçeyeke jiyana me ye û di demajoya xwenasînê de, rêhevaltiya meriv dike û qet nebe, hêviya meriv a xwegihandina 'heqîqetê' xurtir dike. Piştî ku min zaningeh qedand, min dest ji xwendinê berneda û min xwest ez bi zar û zimanê xwe, li ser van mijaran bixebitim. Lê mixabin ji ber tunebûna çavkaniyên bi zimanê kurdî, min gelek zehmetî dîtin. Piştre, min biryara xwe da ku ez hinek kar û xebatên destpêkî bikim. Wê demê, min dest bi xwendina kovar û kitêbên kurdî kir û piştî 2-3 salan, kitêba min a yekem (Dengê Felsefeyê. Weşanên Doz) di sala 2006'an de li Stenbolê hate weşandin. Di sala 2007'an de jî min Malpera Felsefevanê vekir û me dest bi weşanê kir. Armanc ew bû ku me xwest em bi zimanê kurdî, li ser mijarên felsefeyî û zanistên civakî, kar û xebatê bikin. Du caran, êrîşî malpera me kirin û malper, hate rûxandin. Hinekî me navber dabê jî xizmeta malperê hîn jî berdewam e. Ji ber ku navê malpera me jî felsefevan bû, ligel çend hevalên xwe di bîrûraya kurdî de, em jî wekî felsefevan hatin nasîn û me xebatên xwe berdewam kir.

Wê demê gelek nasên min digotin, tu dîn î û tu yê bikaribî çi bikî? Digotin, kurd çîrokan bi zimanê xwe naxwînin û tu dibêjî ez ê bi zimanê kurdî li ser mijarên felsefeyê bixebitim. Lê diviyabû min dest pê bikira, ji bo ku em derengtir nemînin; û min ji xwe dest pê kir. Tiştê min dinivîsîn, min ew li ser malperê jî diweşandin û her wiha li ser medyaya dijîtal jî. Bi saya piştgiriya gelek kesên kurdîziman, dildarên zimanê kurdî û hezkarên felsefeyê, bi hawar û qêrîn be jî axirî dengê me çû bîrûraya kurdî û felsefehezên kurd gotin ku 'felsefe, bi kurdî xweş e.' Bêguman, rêya me dûr û dirêj e û em hîn jî di asta destpêkê de ne.

**Gelo di nav kurdan de xebatên li ser felsefeyê kengî dest pê kirine û di rewş û asteke çawa de ne?**

Zehmet e ku meriv bikaribe tarîxeke berbiçav nîşan bide û bibêje ku felsefeyê di vê tarîxê de dest pê kiriye. Haya min zêde ji Başûr tune ye, dibe ku bi zaravayê soranî hinek xebat hatibin kirin. Lê mixabin li Bakur jî ji bilî çend hewldanên şexsî, xebatên bi rêkûpêk, nehatine kirin. Her wiha, dem û dezgeheke me ya ku bikaribe xweyîtiyê li xebatên felsefeyî bike jî tune ye. Min gelek dixwest ku saziyeke me, di van xebatên min de piştgiriya min bike û xwedî li xebatên min derkeve. Lê mixabin, kesî dengê min seh nekir û ez bi serê xwe mam. Heke piştgiriyeke pozîtîf hebûya îxtîmal e ku min dikaribû gelek xebatên din jî bikira. Ji ber ku karê min kir ne tenê amadekarî ye, di heman demê de karê wergerê ye jî. Çimkî zanînên ku ez wan bi kar tînim, bi zimanê me tune nin. Mecbûr dimînim ku ji gelek zimanan wan wergerînim û kirasekî kurdî, li wan zanînan bikim. Ev jî di vî warî de zehmetiyeke din a mezin e. Lê ne xem e, bi hemd û sebr, ez ê xebatên xwe bidomînim.

Li vir dixwazim hinekî behsa ferhenga felsefeyê ya bi zimanê tirkî bikim: Prof. Macît Gokberk di pêşgotina kitêba xwe ya 'Dîroka Felsefeyê' de ku çapa wê ya yekem di sala 1961'ê de hatiye çapkirin, wiha dibêje: 'Ev kitêb, encama xebata min ya pazdeh salan e. Di kitêbê de, helbet hinek kêmasiyên me hene, bibexşînin. Ev kêmasî çawa ku yên min in, wisa jî yên zimanê tirkî ne ku hêdî hêdî dixwaze bibe zimanê kulturê û ketiye wê rêyê.' Li gel hebûna dewletê jî encax di sala 1961'ê de, ferhengeke felsefeyê bi zimanê tirkî hatiye weşandin. Lê li gel hemû tehde û qedexeyan, li gel hebûna polîtîkayên asîmîlekar û nebûna saziyeke me ya navendî, îro ferhengeke me heye û di xizmeta kurdan de ye.

**Pirsgirêkeke mezin a xebatên li ser felsefeyê jî ew e ku têgehên felsefeyê zehmet tên wergerandin. Di pêvajoya amadekirina ferhengê de te rêyeke çawa da ber xwe û gelo te ji zaravayên din ên kurdî jî sûd wergirt?**

Felsefe, berî her tiştî çalakiyek e, rahişmendiyeke aqilî ya mirovî ye. Kesên ku felsefeyê dikin, lazim e xwedan awireke gelemperî (tevbar, tevî, universal) bin. Dema felsefeyê dikin jî têgihan bi kar tînin û bi vî awayî, metnên felsefeyî derdikevine holê. Pêşî divê meriv bifikire, hinek rûdan, serpêhatî û bûyeran bide ber lêpirsînê, pirsên xwe bike, xwedan awireke şikwer be û bikaribe xwe ji pêşhukmiyan rizgar bike. Hingê dikare bi her awayî ramanên xwe bibêje, bikeve guftûgoyan û rêya xwe bidomîne. Rast e, wergerandina têgehan zehmet e. Lê ya girîngtir ew e ku meriv bikaribe felsefeyê bike û bixwîne. Hingê, meriv bi maneya wê têgihê dizane û heke hebe, dikare di şûna wê têgeha (têgih, kavram, concept) biyanî de, têgiheke bi zar û zimanê xwe, bi kar bihîne. Lê heke tune be, hingê ne mesele ye ku meriv têgiha resen bi kar bîne. Ji xwe em dizanin ku pirraniya têgihên felsefeyî, eslê wan yewnanî ye û ji wir ketine zimanê latinî, fransî, îngilizî û hwd. Mesela di şûna felsefeyê de, bi hêsanî em dikarin bibêjin 'philosophia' jî, ne pirsgirêk e. Di amadekirina ferhengê de, heta ji destê min hat min têgihên kurdî yên ku hene û berbelav in, bi kar anî. Lê min bi xwe, têgih çênekirine û têgihên ku di berhemên kurdî de cih girtine, bi kar aniye. Di gelek cihan de jî min têgihên yewnanî û îngilizî jî daniye. Li ser vê xalê, wekî gotina dawî dikarim bibêjim ku şertê pêşîn ew e meriv bikaribe bi zimanê xwe bifikire. Piştî vê yekê, meriv dikare têgihên ku dê bi kar bîne ji bo xwe peyda bike.


**Li gor Deleuze felsefe çalakiya afirandinê ye, Yanî felsefe hunera afirandin, kifşkirin û hilberandinê ya têgehan e, feylesof jî têgehan kifş dikin û li ser wan difikirin. Lê dema em li civaka cîhanî dinihêrin em dibînin ku di vê mijarê de zêde navûdengê me tune ye. Ango felsefe di nav civaka me de zêde ne berbelav e. Li gor lêkolîn û xebatên te yên li ser felsefeyê sedema tunebûna feylesofên kurd çi ye?**

Gelek kurdan felsefeya xwe bi zimanên serdestên xwe, yan jî bi zimanên ku bazara wan hebûye kirine. Lê, ne tevahiya wan. Feylesofên kurd, hene û em nikarin bibêjin ku tune nin. Çimkî, ew pênaseya 'feylesof' bi xwe jî mijara nîqaşê ye. Lê heke were gotin ku ramanên xwe sîstematîze nekirine, dê ev yek rastir be. Ji ber ku tesîra dîn, gelekên wan wekî şêx yan mela, qebûl kiriye û me, ramanwerî yan jî feylesofiya wan, red kiriye. Vê yekê jî rêya vekolanan girtiye. Kesên bixwazin dikarin ji malperên me, vê bigihînin gelek zanînên der barê vê meseleyê de.

Li ser vê xalê dixwazim hebekî behsa Hegel bikim: Jêdera felsefeya Friedrich Hegel a sêqolî (tez, dijtezî û sentez), sêmediya pîroz a xiristiyaniyê (Bav, Kur û Rihê Pîroz) ye, ku wan jî ji teoriya Hînweriya Rêzepergala Xwedayî (Doctrine of Divine Hierarchy), girtine. Lê kes ji Hegel re nabêje, bes te çi kiriye û îro, wekî damezranerê Îdealîzma Diyalektîk (Diyalektîk Îdealizm, Dialectic Idealism) tê pejirandin. Wekî din jî dema meriv dikeve nav wê çalakiya felsefeyî, pirsan ji xwe dike. Li ser armanca xwe ya jiyanê difikire û dixwaze ku bi 'xwe' û xwe binase. Di rêya jiyaneke bextewar û dilpak (xwedanfazîlet) de, felsefe rêhevaltiya meriv dike û hêviya meriv a xwegihandina heqîqetê xurt dike. Mixabin, zilm û zordestiya cîranên kurdan û erdnîgariya me, gelek caran me ji wesfên me yên resen dûr kiriye û em mecbûr mane ku fikr û ramanên xwe, di bin kirasan de veşêrin. Vê yekê jî komplekseke xwekêmdîtinê li cem me afirandî ye. Beriya çend mehan, min der barê kozmopolîtîzm û êzdayetiyê de, gotarek nivîsî. Lê baş dizanim ku nehatime têgihiştin. Çimkî heta niha kesî li ser vê meseleyê nenivîsiye. Lê bi rêya wê gotarê, min felsefe kiriye. Divê em baş têbigihêjin ferqa xebatên zanistî û yên felsefeyî. Ev xal jî gelek giring e.

**Xebateke te li ser Mensûrê Helac jî heye. Yek ji wan kesên ku bi awayekî pir berfireh li ser Helac xebitiye jî rojhilatnasê navdar Louis Massignon e. Wekî tê zanîn Massignon ji berhema Bazîl Nîkîtîn re jî pêşgotinek nivîsiye. Di berhema xwe de Massignon destnîşan dike ku yek ji çavkaniyên wî yên li qadê jî gelê kurd bûye ku der barê Hellac de agahî dane wî. Gelo tu li ser Hellac çi difikirî û têkiliya wî û kurdan çi ye?**

Belê, der barê jiyan û felsefeya Hellacî (Hallacvan) de kitêbeke min heye: 'Jiyan û Felsefeya Mensûrê Helac' (Enel Heq) - Weş: Evrensel. 2015. Di kitêbê de, min behsa jiyan, berhem û felsefeya Helacî kiriye. Wekî we jî gotiye, çavkaniya piraniya zanînên der barê Helacî de, Louis Massignonê fransî ye ku 30 salên xwe, daye xebata xwe û kitêba wî jêderkeke muhîm û alînegir e. Ne tenê di civaka me kurdan de, di civaka tirkan de jî Helac zahf nayê zanîn. Çend kitêbên hatine nivîsîn jî jêgirtin û xulaseyên berhema Massignonî ne. Lê gelek zanînan jî berevajî kirine. Lê min wekî jêdera sereke, berhema Masignonî bikar aniye û bi awirekî neterefgir, wan raber kiriye. Kurdan, qedr û qîmeteke zahf mezin dane Hellac ku ew bi xwe jî ji binemaleke mazdeîst hatiye dinyayê. Piştre, hatiye gotin ku piştgiriya serîhildana Karmatî (wekî serîhildana kurdan hatiye zanîn) kiriye û ev yek jî bûye yek ji wan sebebên kuştina wî. Ez bi xwe nizanim bê ka Helac kurd e yan na, lê dikarim bibêjim ku gelekî piştgiriya kurdan kiriye û tesîra wî, li ser çanda me zahf e. Mixabin wekî gelek peyayên hêja, haya me zahf ji Hellacî jî tune ye û divê em bi zar û zimanê xwe bêtir li ser wan peyayan vekolînan bikin.




Di berhemên me yên klasîk de, gelek ramanên felsefeyî hene. Mixabin, hê baş nehatine vekolandin. Der barê Zerdeşt Pêxember û postmodernîzmê de, min hinek lêkolîn kirin û ez bi xwe jî ji tesîra wî ya li ser feylesof, ramanwer û ruhnasên naskirî, şaş û ecêbmayî mam

## Alî Gurdilî kî ye?



Ali Gurdilî di sala 1966'an de li bajarê Sêrtê li navçeya Misircê (Gurdilan) hatiye dinyayê. Di sala 1980'î de malbata wî koçî bajarê Tirkiyeyê- Îzmîrê kiriye. Gurdilî li Zanîngeha Ege ya Îzmîrê beşa civaknasiyê xwendiye û ji wir mezûn bûye. Heta niha gelek gotarên wî yên zanistî û felsefî di kovarên wek Kovara W, Tîroj û Xwenas, Felsefevan û Ajdayê de hatine çapkirin. Alî Gurdilî niha jî di warê zanistî û felsefî de xebatên xwe didomîne.

# Derfetên zimên û vegotina wêjeyî



Îbrahîm Seydo Aydogan

Ziman wêneyê hişê mirov nîşan dide. Mirov dunyayê li cem xwe çawa bisewirîne, tiştan û alav û bûyer û kesan çawa binirxîne, şopa vê şiyana wî ya dîtin û nirxandin an têgihîştina tiştan jî xwe di zimanê wî re dide der.

Zimanê axavtinê û yê nivîsê, bivê nevê, ji hevdu cuda ne. Zimanên ku di nivîsê de gelekî hatine bikaranîn derfetên xwe baş kişf û peyda kirine û alîkariya derbirîna kompleksiya wêneyên nava hişî nîşan dane. Weke ku Voltaire di ***Ferhenga Felsefeyê*** de digot, her ziman li gorî pêdiviyên axêverên xwe bi pêş ve ketiye. Herçî nivîs e, pêdiviyeke vegotin û ravekirin û derbirînê bû.


Avakirina nivîsê bi kûrahiya ramanî ve têkildar e, lê belê jê bêtir, bi zîrekî û kamiliya zimanî ve ava dibe. Hişê nivîskariyê çi qasî bipêşketî be, ew ê di bikaranîna derfetên zimên de jî ew qasî zîrek be. Lewra xurtbûna nivîskêr xwe di zimanî wî re dide der. Hingê, her nivîskar çalakiya zimanî di ber bikaranîn û kişfkirin û xurtkirina zimanî re pêk tîne. Helbest çendî hakimiyeta zimanî digel wezn û kafîye û rîtmê ve bide jî, pexşan di vî warî de baştirîn alava nîşandayina derfetên zimanekî ye.

Ev hişmendiya pexşanê ku nemaze di berhema Marcel Proustî de xwe bi hevokên kompleks ve nîşan dide, dikare di berhemeke din de jî bi awayekî din derkeve holê. Derbirîna sûretê nava hoişî, teva sadaqata bi wî sûretî re, ne guncaw e ; ji ber wê ye ku filozofên mîna Cratyle bi biryareke radîkal ve gihîştibûn wê baweriyê ku ziman xiyanetê bi ramanê û bi hişî ve dike û hingê bêkêr e. Digel vê jî, ji zimanî xurtir alava derbirîna hişî jî mixabin nîne.

Ji wêneyên ser dîwarên şikeftan ve peydakirin û xebitandina derfetên zimanî îroj bi huner û nivîsê ve gihîştiye radeyeke bilind. Fikir ziman bi xwe ye û ziman fikir e. Şêwaza wêjeyî hêza vegotinê nîşan dide, lê zimanê nivîsê herweha wê derfetê dide ku bi qodên hevpar ve ew sûretê hiş û ramanê jî bigihîje muxattabên xwe. Herçî pexşan e, çaktirîn derfeta zimanî ye ku heta sedsala 18'an jî di wêjeyê de weke çareyeke qels dihat nirxandin, lê bi dû re qiymetê wê hate fahmkirin. Di rewşa zimanên mîna kurdî de ku helbesteke wî ya klasîk ya xurt hebû, pexşan bû alava ku wî xwe pê li qada zimanan rakişand. Lewre pexşan, hemû derfetên zimanekî yên kêmbikarhatî derdixe holê û wan çalak dike. Ji ber wê ye ku divê mirov tucarî nebêje « bipêşxistina zimên ». Mirov nikare zimanekî bi pêş ve bixe, lê belê mirov dikare derfetên wî yên ku di ragihandin û ravekirinê de pêwîst in kişf bike û bi xelkê jî bide naskirin.

Li gora Proustî, zîrekiya nivîskarekî di hevokên wî de ye û pisporên wî yên mîna Leo Spitzer, di ***Études de Style*** de, li ser pirsgirêka hevokên wî yên dirêj, dibêjin ku ji ber wê ye ku Proust hewil daye ku gelek agahiyan di nava hevokekê de û bi carekê ve bide ; lewre, li gorî wî, di jiyanê de tişt bi hev re di nava peywendiyeke kompleks de ne û hiş wan teva vê peywendiya wan dinirxîne û hingê bi dû re diteyisîne ser zimên û ji zimên jî ser nivîsê.

Ligel gelek nûbûnên din ku bi pexşanê re hatine zimên, di vegotina romanesk û wêjeyî de bikaranîna hevokên kompleks ku weke haveynê zimanê kemilî tê pejirandin, ji bo nuha radeya herî bilind e ku ziman dikare xwe bigihînê, lewre awayên hişî yên tevgerê û dîtina wî ya global û dawerivandina tiştan ya ji aliyê hişî ve, heger ziman bi rastî jî alava derbirîna wêneyên nava hişî ye, bi tenê bi bikaranîna zimanekî weha ve guncaw e. Heger hiş mirovekî şoqereş teva hevalê wî yê bêvildirêj û hevala wî ya guhbel û pismamê wî yê kose û dotmama wî ya devçarox dibîne û wî weha li cem xwe nas dike, hingê ziman jî divê vê peywendiya wî ya bi tiştan û kesan re weke xwe û di nava vê peywendiya pirhêl de bide. Di zimanê nivîsê de jî ev peywendiya jiyanê bi rêya hevokên kompleks û gîhanekan ve tê sazkirin ku di zimanê kurdî de awayên wan yên hêsan di jiyana rojane de gelekî tên bikaranîn. Karê nivîsê îroj ew e ku awayên veşartî derxe holê û sînorên zimanê me bicerribîne.



Di roja îroj de, ji nava derfetên pexşanê, ya ku ji zimanê me kêm maye jî ew e ku ev taybetmendiya pexşanê baş nehatiye xebitandin. Elbet, ev yek ji bandora zimanê devkî tê. Lewre zimanê devkî, heta ku jê tê, ramanan rasterast û beyî tevliheviyê rave dike. Lê belê, hevokên kompleks, beyî ku bibe armanc, dikarin rêyê li ber qutbûyina vegotinên wêjeyî bigirin ku em di gelek berhemên kurdî de dibînin. Erê, mebest zimanê nivîskî ye, lê ev awa dikare zimanê devkî jî biguherîne. Ji bo têgihîştinê, çêtir e ku mirov mînakekê bide ku me berê jî gelekî bi kar aniye.

*« Hecî Zorav dixwest, xwe ji Zibeyr xilas bikira. Wî ev kar û bar jî dabû Hesenê Meysê. Roj tune bû ku Hesen bela xwe li Zibeyr neda. Lê Zibeyr nediket dafikên Hacî Zorav. Haya Zibeyrê Ehmê ji bayê dinê hebû. »*

Qutkirina ramanê, dubarekirina navan û hewla vegotina ku li xwe dilukume bi awayekî zelal di vê mînakê re xuya dibe. Mînakên weha di berhemên kurdî de mixabin gelek in û heger bi zimanekî din bûya, xelkê dê bawer nekiraya ku nivîskarekî xurt ev hevok nivîsandine.

Ka em agahiyên ku nivîskar bi van hevokan vedibêje, deynin ber xwe.

Hecî Zorav dixwaze xwe ji Zibêr xilas bike.

Ji bo vî karî, peywirê dide Hesenê Meysê.

Hesenê Meysê bela xwe tim di Zibêr de dide.

Lê Zibêr nakeve dafikên wan.

Hayê Zibêr ji bayê dinyayê heye.

Di vê mînakê de, pênc agahî hene ku nivîskêr, beyî ku ji derfetên ziman û nivîsandinê destkewtî bibe, her yek bi hevokekê rave kiriye. Ger em bixwazin ji bo heman agahiyan awayekî vegotinê yê din bi kar bînin, nivîskarî dê bi temamî biguhere :

***« Hecî Zoravê ku dixwast xwe ji Zibêr xelas bikiraya, ji bo vî karî Hesenê Meysê peywirdar kiribû. Digel ku roj tune bû ku Hesenê Meysê bela xwe di Zibêr de nedida jî, Zibêrê ku hayê wî ji bayê dinyayê hebû, tucarî nediket dafikên wan. »***

Mirov dikare bi gihaneka « û »yê, vê mînakê bi hevokekê jî vebêje. Bi guhertina me re, hemû agahiyên ku têkildarî hev in, beyî ku ji hevdu qut bibin, ji bo ku hêrka zimên û ya vegotinê xera nebe, li dû hev in. Lewre, heger Zibeyrê Ehmê zilamekî zîrek e û hayê wî ji dunyayê heye û vebêjer jî Zibeyrê Ehmê teva van taybetmendiyên wî dadiwerivîne, hingê gava ku mirov navê wî bibêje û behsa bûyera wî bike, mirov nikare van agahiyan ji bîr bike. Heger nivîskar ji bîr bike jî, hiş jî bîr nake. Heger bi rastî jî peywendiyek di navbera zimên û hişî de hebe, hingî divê em tiştan û kesan û bûyeran weke ku di hişî de hene rave bikin. Ziman gava ku kete nava tevliheviyên tevgerên hişî, hingê dikare hemû derfetên xwe yên mirî çalaktir bike.

Erê, kurmancî xezîneyek e, kesê ku daketiye binê bîrê, heta nuha destvala venegeriyaye. Lê dîsa jî derfetên zimanê me yê vegotinê hê baş nayên bikaranîn.

Ma gelo divê mirov vê kêmaniyê bixe stuyê kurmanciyê an nivîskariyê ?

***Mahmut Baksî.- Gundikê Dono.- Stockholm : Orfeus, 1988.- 107 r..- (r. 27). (Yek ji wan romanên ku nivîskarê vê nivîsê jê hez dike ev romana Mahmûd Baksî ye, ji ber wê, gava ku ew ji bo ravekirina hin têgehan nimûneyên vê romanê bi kar tîne, divê mirov nebêje qey ew romanê rexne dike. Di vê nivîsê de bi tenê behsa zimên dibe.)***

# Girîngiya têgih, têgihiştin û têkiliyên civakî



Adar Jiyan

Destpêka hemû danûstandin û têkiliyên navbera mirovan a rû bi rû axaftin e. Axaftin hem pêdiviya têkiliyên rojane û hem jî alava derbirîna fikr û boçûnên mirov e. Belê ji bo axaftinê jî pêdivî bi têgihan heye.

Çi tişt û heyberên ku tên dîtin û sêwirandin û bûyer û lêqewmînên ku pêk tên hemû di bin navekî hevpar de di binhişê me de bi cih dibin. Û em wî tiştî bi wî navî nas dikin û didin nasandin. Ew navê ku ji bo naskirin û nasandinê dibe bingeh, têgih bi xwe ye. Bêyî têgihê ne axaftin, ne vegotin û ne jî têgihiştin pêkan dibe.

Têgiha ku wateya xwe nebîne, têgihîştina wê zehmet dibe. Tênegihîştin dibe sedema gelemşeya têgihan. Gelemşeya têgihan pirê caran dibe sedema lêkdanên civakî û şer û pevçûnên domdar ên ku bi salan didomin. Şer û pevçûnên ku arîşe, rûxan û karesatên civakî pêk tînin jî dibin sedema êş û azarên mayînde û kul û birînên derûnî yên ku bi salan nacebirin. Ji bo wê, hem divê têgih li gor wateya xwe bên bikaranîn û ravekirin û hem jî naveroka wan baş were famkirin.

Çi erênî û ji neyînî dibin hemû têkilî bi saya ragihanê pêk tên. Ragihan çiqas erênî be, têkilî, danûstandin û têgihîştin jî ewqas erênî; ragihan çiqas neyinî be, têkilî, danûstandin û têgihîştin jî ewqas erênî dibe. Têkiliyên neyînî, hem dibin sedema pirsgirêkên civakî û hem jî ragihand û têgihiştinê diewiqînin. Ji bo pêkhatina têkiliyên civakî pêdivî bi vegotin, guhdarîkirin û têgihîştinê heye. Belê berî hemû pêwendiyên civakî, pêdivi bi watedayina têgihan a rastîn heye. Gava ku têgih rast neyên watedayin û ravekirin, ne têkilî bi awayekî erênî pêk tên û ne jî ragihan digihîje armanca xwe. Bêguman bêyî têgihan, ne axaftin û vegotin û ne jî têkilî û têgihiştineke erênî pêkan dibe.

Ji bo pêwendiyên civakî, pêdivî bi axaftin (vegotin), guhdarîkirin û têgihiştinê heye. Ji bo axaftin (vegotin) û têgihîştinê jî pêdivî bi sê tiştan heye: Yek; peyv û gotin, du; deng û bilêvkirin, sê; liv û tevger e. Li gor lêkolînên pedagog û derûnnasan, di pêwendiyê de; kesên ku bandorê li ser kesên pêşberî xwe dikin bi vî awayî ye: % 10 girîngiya peyv û gotinan, % 30 girîngiya deng û bilivkirinê, % 60 girîngiya liv û tevgeran e.

Têgihiştin, pêdiviya veguhastina hest û hizrên mirov ên ku bi riya vegotinê tê derbirîn e. Têgihiştin, bi saya têkilî û danûstandinê ragihanê pêkan dibe. Danûstandin û ragihan bi gelemperî bi sê awayan pêk tê. Yek; ragihana devkî, du; ragihana nivîskî, sê; ragihana bedenê ye.

Ragihana devkî, bi axaftin, vegotin û derbirîna rû bi rû ya kesên ku tên pêşberî hev, pêk tê. Di ragihana devkî de, tiştê ku awa û çawaniya têkiliyê diyar dike ne tenê gotin û vegotin e. Li gel gotin û vegotinê, asta deng û liv û tevgerên bedena kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne jî roleke girîng dilîzin.

Ragihana nivîskî, bi alavên nivîskî yên wekî name, pirtûk, rojname, kovar û hwd pêk tê. Di ragihana nivîskî de kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne hevdû nabînin; bi saya nivîsê hevdû dinasin û têkiliyê datînin. Di ragihana nivîskî de tiştê herî girîng zimanê nivîsê ye; ango rêzman, rastnivîs û xalbendî ye. Ji bo têgihiştineke rastîn divê zimanê nivîsê rast were bikaranîn.

Ragihana bedenê, bi liv û tevgerên bedenê pêk tê. Ragihana bedenê wekî zimanê bedenê jî tê navandin. Kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne, ji axaftin û vegotinê bêtir bedena xwe bi kar tînin. Ragihandina kesê/a ku rasterê peyameke rastîn dide kesên pêşberî xwe, zimanê wî yê bedenê bi xwe ye.

Lewre dibe ku mirov di ragihana devkî yan ragihana nivîskî de rastiyê veşêre an venebêje; belê liv û tevgerên bedena mirov tucar derewan nakin û her gav peyameke rastîn didin kesên pêşberî xwe.

Zimanê bedenê hem bikaranîna bedenê û hem jî sekna kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne diyar dike. Sekna bedenê bi sê awayan pê tê: Sekna bifikar, sekna êrîşkar û sekna ewledar.

Sekna bifikar, sekneke neyinî ye; ewlehiyê nade kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne. Kesên ku bi fikar tevdigerin heman gavê kesên pêşberî xwe jî tuşî nav fikaran dikin. Di têkiliyê de fikar û dudiliya mirov, dilsozî, dilpakî û dilgermiyê ji holê radike.

Sekna êrîşkar, sekneke neyînî ye; ew jî ewlehiyê nade kesên pêşberî xwe. Kesên êrîşkar hem êrîş dikin û hem jî ew bi xwe dibin hedefa êrîşan. Erîşkirin, heke ne ji bo xweparastinê be, ji ber bêewlehiyê ye.

Sekna ewledar, sekneke erênî ye. Sekna ewledar, sekna kesên ku bi xwe ewle ne û ewlehiyê didin kesên pêşberî xwe. Kesên ku têkiliyên wan li ser riknê wekheviyê ava dibin, ewlehiyê didin hevdû. Ewlehî misogeriya jiyana aram û aştiyane ye jî. Aştî, asêgeha ewledariyê bi xwe ye.

Bi kurtasiya gotinê; têgiha ku wateya xwe ya rastîn nebîne, baş nayê famkirin jî. Di ragihanê de têgihiştineke rastîn pêk neyê, vegotin bi avê de diçe. Ji bo wê divê kesên ku bi hev re di têkiliyê de ne herî kêm bi qasî hevdû bi hestiyarî û pejnkarî tevbigerin. Ji bo wê jî divê di têkiliyê de her têgih di cihê wê de bi awayekî rast bê bikaranîn. Nexwe ne wateya axaftin û vegotinê û ne jî girîngiya famkirin û têgihiştinê dimîne.



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Statuya Rêvebiriya Xweser hat nasîn

Di 22'yê hezîranê de heyeteke ji Herêma Xweser a Katalonyayê serdana Bakur û Rohilatê Sûriyeyê kir. Ev heyeta ku parlementer û siyasetvanên katalonî Lûlîa Regovat, Robîn Wagensber û Laûra Breezî jê re pêşengî dikir li gelek bajar û navçeyan xebatên rêxistinbûyina rêvebiriya xweser di cîh de şopandin.

Şandeya katalonî di çarçoveya xebata xwe de bi Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê re jî hin hevdîtinan pêk anî. Ev hevdîtin û çavdêriya şandeyê ji bo nasîna statuya rêvebiriya xweser xwedî cihekî girîng e.

Piştî heyeta katalonî vegeriya, endamên vê heyetê li welatê xwe dest bi xebatên ji bo nasîna statuya Xweseriya Demokratîk a Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê kirin. Bêgûman di vir de xebatên erênî yên diplomasiya revebiriya xweser jî hene.

Di encama van xebatan de di 20'ê cotmehê de ji bo pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi taybetî jî ji bo gelê kurd civînek girîng pêk hat. Di vê rojê de Parlamentoya Katalonyayê ji bo nasîna statuya Rêvebiriya Xweser a Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê li hev civiya.

Seroka meclisa Parlamentoya Katalonyayê rûniştin bi sernavê dengdana ji bo nasîna statuya rojavayê Kurdistanê da vekirin. Cara yekemîn e ku di vê astê de ji bo qebûlkirina siyasî ya rojavayê Kurdistanê rûniştineke taybet hat lidarxistin.

Piştî re li ser navê koma partiyan parlamenterên katalan, derbarê girîngiya nasîna statuya rêveberiya xweser de axivîn. Parlamanteran destnîşan kir ku bi saya fikrên Rêberê PKK'ê Abdulah Ocalan li rojavayê Kurdistanê bi pêşengiya jinên kurd, bi pêşengiya gelê kurd li ser esasên konfederalîzma demokratîk, jiyaneke nû hatiye avakirin. Parlamenterên axivîn gotin: "Divê em hemû gelê katalan, gelên Ewropayê xwedî li vê şoreşê derkevin."

Di axavtinên hatin kirin de bi awayekî berfireh bahsa rola rojavayê Kurdistanê ya di têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de jî hat kirin. Bi vê girêdayî gefên Erdogan ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hevkariya dewleta tirk bi komên çeteyan re jî bûn mijarên axaftinên parlamenterên katalon û gotin: "Divê em di hemû qadan de, madî, manewî û siyasî bi kurdan re bin."

Di civîna ji bo nasînê de li ser çar xalan dengdayin pêk hat. Ji ber vê yekê her xal cuda cuda hatin xwendin û dengdayin jî li gor wê hat kirin.

Di xala yekemîn de weke mijareke siyasî Parlamentoya Katalonyayê hebûna Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê ya ku li ser bingeha konfederalîzma demokratîk hatiye avakirin qebûl kir û saziyên katalanî dê têkiliyên sazûmanî deynin.



Di xala duyemîn de li ser konfederlîzma demokratîk ya komunal, azadîxwaz ya jinan û ekolojiyê ku li Rojhilata Navîn dê bibe modela jiyana aştiyane hat axaftin.

Di xala sêyemîn de jî bang li rêxistin, civaka sivîl û hemwelatiyên Katalonyayê kirin ku beşdarî jinûveavakirina herêmê bibin û bi hevgirtinê hem ji bo avakirina madî ya welat û hem jî ji bo pêşwazîkirina penaberên daîmî yan demkî, pêş bixin.

Di xala çaremîn de Parlamentoya Katalonyayê komîteyên ji rêveber, rêxistin û civaka sivîl pêk tên vedixune avakirna tora hevgirtin û pêşxistina têkilîyan.

Dengdana ji bo nasîna statuya Rêvebiriya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li ser van her çar xalan hat kirin û bi piraniya dengan qebûl bû. Di van xalan de tişta ku herî girîng pênaseya konfederalîzma demokratîk e.

Di encama axaftinan û pêşniyarên hatine kirin de di parlamentoyê de dengdayin hat kirin. Di encama dengdanê de hema bêje bi yek dengî statuya rêveberiya xweser hat nasîn. Ev biryara parlamentoyê ji aliyê kesên wek çavdêr tev li rûniştinê bûbûn bi çepikan hat pîroz kirin. Parlementoya Katalonyayê bû yekem parlementoya ku statuya Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nas dike.

# Dema dilopa dawî di ser re avêt û bû lehî

Eylem Şoreş

Gelo wê heya kengî ev êrîşên dagirkeriyê yên dijmirovî dewam bikin? Dema ez vê yekê ji xwe dipirsim, di serî de fikira min diçe qada şer. Pişt re diçe cem dayîkên ku dilê wan disoje. Em roj bi roj bang û hawara dayikan dibînin û dibihîsin. Roj bi roj wan nûçeyan dixwînin û parve dikin. Ji serê vê mehê ve li deriyê sînor yê Sêmalkayê di serî de dayik, malbatên cangoriyan ji bo cenazeyên zarokên xwe di çalakiyê de ne. Çiqas trajîk e newisa? Destpêkê bi hovane êrîş dibin ser, şehîd dixin û bi ser de jî îşkencê li malbatan dikin. Ev rêbaza dewleta tirk e. Ji ber ku di hovîtiya xwe de ti sînoran nas nakin. PDK jî xeta dijmin dişopîne û bi heman rêbazî êrîşî gelê kurd û şervanên wê dike. Niha em biçin destpêka bûyerê.

Dewleta tirk di 23'yê nîsanê de bi helwesta dagirkirina axa Kurdistanê dest bi şerê li Herêmên Parastinên Medyayê kir. Ev ne cara ewil e ku eskerên tirk li wir derb ji gerîlayên HPG û YJA Starê dixwin. Lê ji ber ku dijminê xwînmij piştî Garê nikare binketineke din rake bi hemû rêbazên qirêj li wir êrîş dibe ser gerîlayan. Mijareke sereke ya di vê şerî de hevkariya PDK'ê ye. Ya din jî êrîşên bi çekên kimyewî ne. Dema em bikaranîna çekên kimyewî bigirin dest, ez destpêkê dixwazim vê pirsê bipirsim? Dewleta tirk wan çekên qaşo qedexekirî ji ku distîne? Belê ez bawer dikim hema bêje herkes bersiva vê pirsê dizane. Ji bo yên ku nizanin: Ji dewletên Ewropayê. Yek ji dewletên ku xwe bi ser firotina çekan dewlemend kiriye jî dewleta Almanya ye. Parlamentera partiya çepgir ya Almanya Gokkay Akbulut hefteya çûyî pêşnûmepirsek pêşkêşî hikûmeta Almanyayê kir.

**Bersiv ji bêdengiyê cudatir nînin**

Parlamenter Gokkay Akbulut di pêşnûmepirsa xwe de pirsîbû gelo haya hikûmeta alman ji êrîşên bi çekên qedexkirî heye? Ev pirs di cih de ye. 2 roj piştî pêşnûmepirsê jî bersiv hat dayîn. Heya niha dewletên Ewropayê û cîhanê bi giştî xwe li bêdengiyê girtin, hevkar jixwe bêdeng dimînin. Bersiva hat dayîn jî ji vê bêdengiyê ne cuda bû.

Musteşarê Wezareta Karê Derve Miguel Berger gotibû; hikûmeta Almanya bûyerên ku li bakurê Iraqê rû didin ji nêzîk ve dişopîne û bi muxataban re di nava hevdîtinê de ye.

Musteşarê wezareta karê derv gok avêt ser Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî OPCW û îdîa kir ku OPCW pêkanîn yan jî nepêkanîna Peymana Qedexeyê ya sala 1997'an dişopîne.

Lê nûçeyên derbarê bikaranîna çekên kîmyewî tiştekî cuda nîşan didin.

16'ê cotmehê ajansa nûçeyan ya Firatê nûçeya 3 gerîlayên ku ji êrîşa bi çekên kîimyewî ya dewleta tirk filîtîn weşandibû. Gerîlayan di nirxandinên xwe de bi detayan qala bandora gaza jehrî kirin. Dema min ev nirxandin guhdar kir, dîsa ev pirsa yekem hat bîra min lê gerîlayan di nirxandinên xwe de peyamek gelek girîng anîn ziman. Wan gotinên Şehîd Botan Ozgur bibîr anî ku gotibû; leşkerên tirk ewqas ditirsin ku dema dengê bêhna hevalên me ji nêz ve tê jî newêrin xwe nêz bikin. Rastî jî ew gotinên ji şervanekî azadiyê, ne mimkun e ku mirovan bêbandor bihêlin. Tirs kete nava dilê dijmin.

**Gerîla bi rola pêşengtiyê radibe**

Ji bo xwe bi hêz bike, PDK hevkariyê bi dagirkeran re dike. PDK'ê her çi qasî xwest bi veşartî tevgera xwe ya li dijî gelê kurd pêk bîne jî ev yek nebû. Bi zexta dewleta tirk êdî ev veşartîbûn jî nema. Her tişt niha li holê ye. Hikûmeta başûrê Kurdistanê li Xelîfanê bi kemînekê, şervanên leheng şehîd xistin. Ev yek jî dilopa dawî bû. Dijminatiyek ji dijminê esil zêdetir dike. Bi derdê desthilata xwe xurt û fireh bikin her tişt danîn kêlekê. Gelo cuda çi lazim e?



Gerîla bi berxwedana xwe bi rola pêşengtiyê radibin. Ew bi taktîkên nûjên ên gerîla li dijî artêşa hov li ber xwe didin û derbên mezin li dagirkeran didin. Teknîka herî nû têk dibin. Ger ev teknîk û ev çekên jehrî nebûna leşkerên bi pere yên dewletê rojekê jî nikaribûn xwe li çiyayên Kurdistanê li ser lingan bigirin. Niha dora xwedîderketin û dane bihîstina vê berxwedanê ya gel e.

Min di destpêka nivîsê de jî bal kişandibû ser. PDK tevî êrîşan, cenazeyê şehîdan jî radest nakin û mafê herî rewa yê dayikan ji wan digirin. Ev yek jî êşa dayika kûrtir dike. Dayik tevî hertiştî dest ji têkoşîna xwe bernadin û êşa xwe vediguherînin hêrsê. Ew jî hikûmeta PDK'ê tenê dixwazin ji xeta ixanetê vegerin. Lê ew çalakiya li Sêmalka wê ji bo zextê li dagirkeran bikin têrê neke. Gelek caran gelek şexs, rêxistin û partiyan bang kirin lê, guherînên pewîst hîn çênebûne.

**Bersiv di nav berxwedanê de ye**

Heya ku zext zêde nebin û êrîşkar û dagirker li tevahî cihanê teşîr nebin ew ê dawiya kiryarên PDK'ê û dewleta Tirk jî derengtir bikeve. Erê min pirsîbû heya kengî.. bersiva vê pirsê li cem her kesê veşartî ye. Çiqasî hêrsa li dijî wan kiryaran bilind bibe û çiqasî dengê gel û dayikan bilind bibe ewqasî jî wê ev dem nêz bibe.

Bersiva ku me nivîsa xwe pê destpê kir jî ewqas nêz e. Bersiv di nava dengê dayikan de ye. Di nava hêrsa gelê kurd, di nava berxwedana bêhempa ya gerîla û axa Kurdistanê ku bi xwîna şehîdan hat avdan de ye.

# Peymanên çekên kîmyewî û pergala durûtiyê

Navenda Nûçeyan

Tirkiye êrîşên xwe yên ku di 23'ê nîsanê de li başûrê Kurdistanê dabû destpêkirin bi çekên kîmyewî didomîne. Di êrîşên hewayî yên 3 mehên dawîn de bi dehan endamên HPG'ê jiyana xwe ji dest dan. Lê cîhan li dijî sûcê mirovahiyê û çekên kîmyewî bêdeng e

Li cîhanê ji salên 1600'î heta niha dewletan di şer de gelek caran li dijî hev çekên kîmyewî bikar anîne. Çekên kîmyewî di şer de bandorek pir mezin li ser jiyana mirovan û li ser xwezayê çêkiriye. Rêxistinên navneteweyî ji bo bikaranîna çekên kîmyewî bêne qedexekirin peyman dane îmzekirin. Ligel ku heta niha gelek caran peyman hatine îmzekirin jî dîsa dewletan li hemberî hev çekên kîmyewî bikar anîne û sûcên şer kirine.

**Peymanên xwe bin pê kirin**

Li cîhanê cara yekemîn di 1675'an de bi tevlîbûna 2 welatan Peymana Strasbourgê hat îmzekirin. Di sala 1899'an de jî bi tevlîbûna gelek welatan Peymana Lahey hat îmzekirin. Lê piştî peymana Laheyê Şerê Cîhanê yê Yekemîn li Ewropayê pêş ket. Di şerê cîhanê de gelek welatan li dijî hev çekên kîmyewî bikar anîn. Peymana Lahey binpê kirin û çend sal beriya Şerê Cîhanê yê Duyemîn Protokola Cenevreyê hat îmzekirin. Lê piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn Îran û Iraqê di şer de li dijî hev çekên kîmyewî bikar anîn. Di 29'ê nîsana 1997'an de peymanek din hat îmzekirin.

Peymana Çekên Kîmyewî (CWC), di sala 1993'an de bi tevlîbûna 187 welatan hat îmzekirin. Di vê peymanê de Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) biryar girt ku 188 welatên peyman îmze kirine heta nîsana 2007'an divê hemû çekên kîmyewî yên di destê xwe de tune bikin.

**Bêdengiya rêxistinan**

Ligel biryara Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) û Peymana Çekên Kîmyewî (CWC) Tirkiye li dijî kurdan çekên kîmyewî bikar tîne. Lê balkêş e dema Tirkiye li dijî kurdan çekên kîmyewî bikar tîne, bi hevkarî û destê PDK'ê van çekan bikar tîne. Bi taybetî di meha îlon û cotmehê de Hêzên Artêşa Tirk (TSK) li başûrê Kurdistanê bi destûr û hevkariya PDK'ê bi dehan caran çekên kîmyewî bikar anî. Şehîdkirina şervanên kurd û mirina welatiyên herêmê piştrast dike ku Tirkiye bi balafirên şer bi destûra PDK'ê li dijî gel û şervanên kurd çekên kîmyewî bikar tîne. PDK bi vê yekê sûcê şer dike.



Li başûrê Kurdistanê ji Heftenîn, Metîna, Kanîmasî û Zapê heta Avaşîn û Werxelê bi mehane TSK bi hevkariya PDK'ê bi çekên giran êrîş dike. Tirkiye ji bo karibe êrîş û çavdêriyên li seranserî herêmên navborî bi pêşve bibe; çekên giran û teknîka pêşketî bikar tîne. Li herêmê bi hevkariya PDK'ê sîxuriyê pêş dixe. Bi kamera, drone (SÎHA) û teknîkên pêşketî herêmê dişopîne. TSK'ê hertim hewl da ku Mervanosê, Girê Mamreşo, Pîramîtên Avaşînê, Geliyê Kinyaniş, Nerwê û qadên Keleha Bedewê yên herêma Zapê, Girê Zendûra, devera Derarê û Geliyê Koordînê yên Metînayê bi dest bixe. Di şerê li dijî HPG'ê de her diçe hejmara kuştiyên TSK'ê zêdetir dibe. Ji ber vê yekê jî pişta xwe da PDK'ê.

**Tirkiye bi hevkariya PDK'ê şer dike**

PDK'ê ewilî bi awayekî veşarî piştgirî da TSK'ê. Lê niha hêzên taybet ên girêdayî malbata Barzanî û PDK'ê; Hêzên Zerewanî, Gulan û yên navê "Pêşmergeyên Roj" li xwe kirine, bi awayekî aşkera ji sînorê herêma Metîna, Bradostê heta Bînarê Qendîlê li gelek deveran bi navê noqteyên lêgerînê, ji TSK û MÎT'ê re baregeh avakirine. Li aliyekî baragehan ava dikin, li aliyê din herêmê bombe dikin û çekên kîmyewî bikar tînin. Gelê Behdînanê ligel bombebarana zêde jî naxwazin gundên xwe terk bikin. Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku rayedarên Tirkiyeyê derbasî başûrê Kurdistanê bûne, bi rayedarên Polîtburoya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) re hevdîtin kirine. Ji muxtarên herêmê xwestine ku der barê tevgera PKK'ê de agahî bidin wan û gef li wan xwarine. Ji muxtaran xwestine ku der barê bikaranîna gazên jehrî de agahiyan nedin.

Çavkaniyan diyar kirin ku bi taybetî di nav mehekê de li Kanîmasî û derdora wê û li herêma Behdînanê 548 kesan bi giliya sorbûna çavan, xumamiya dîtina çavan, serêşandina ji nişka ve, xwînbûna poz, zehmetiya bêhngirtinê, sorbûna laş, serî li nexweşxaneyên Duhok û derdora wê dane.

**Qetilkirinên bi çekên kîmyewî**

TSK'ê di 3'yê îlona 2021'ê de li Girê Sor yê Avaşînê çeka kîmyewî bi kar anî û 6 gerîlayan jiyana xwe ji dest dan. Di 5'ê cotmehê de li Werxelê çekên kîmyewî bi karanîn û 5 gerîlayan jiyana xwe ji dest dan. Ev agahiyên şênber nîşan didin ku TSK bi hevkariya PDK'ê li herêmê şer dike û çekên kîmyewî bikar tîne. Ên peymanan çekên kîmyewî binpê dikin û bikartînin sûcên şer dikin. Yek ji aliyên ku sûcê şer dike jî Tirkiye û PDK ye.

Li gorî agahiyên şahidan, li Dihokê û li herêmên Kanîmasî û Amediyê 7 kesên sivîl jehrî bûne û mirine. Ev yek hatiye piştrastkirin. Dibe ku hejmar pir zêdetir be jî. Lê PDK bi tundî rê li pêşiya vê rastiyê digire. Çavkaniyên saxlem agahî dan ku li gundê Bêgovan di 13'ê cotmehê de 10 kesên sivîl ku bi vê jehriyê ketine, çûne nexweşxaneyê. Ji wir jî bi lezgînî şandine nexweşxaneya beşa hewarhatinê ya Dihokê. Hinek ji wan mirin. Hinek kes jî ji navçeya Şêladizê bi heman nîşanên jehrîbûnê ji nexweşxaneya Şêladizê şandin beşa hewarhatinê ya Dihokê. Rayedarekî ji nexweşxaneya beşa hawarhatinê ya Dihokê diyar kir ku Nexweşxaneya Duhokê pir taybet e, nepene û di bin çavdêriyê de ye.

**Di 21'ê Cotmehê de:** Parlementerê Îtalyayê Erasmo Palazzotto ji ber ku Tirkiye li dijî kurdan çekên kîmyawî bi kar tîne, pêşniyaznameyek da meclîsê. Palazzotto anî ziman ku Tirkiye li Zap, Metîna û Avaşînê ji 23'yê nîsanê heta niha bi awayekî sîstematîk çekên kîmyewî bikar tîne.

**Di 14'ê cotmehê de:** Partiya Çepgir,(Die Linke) mijara ku Tirkiye di operasyona li dijî Herêma Federel a Kurdistanê de, çekên kîmyewî bi kar tîne bir rojeva Meclisa Federal a Amanyayê.

**Di 9'ê cotmehê de:** HPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku dewleta tirk a dagirker li Werxelê di 5'ê cotmehê de çekên kîmyewî bi karanî. HPG'ê da zanîn ku di erîşa namerdane de 5 gerîlayên wan şehîd bûne.

**Di 4'ê cotmehê de:** welatiyên li Binarên Qendîlê dijîn çekên kîmyewî ku ji aliyê Tirkiyeyê ve tên bikaranîn bang li her kesê kirin da ku dakevin kolanan. Welatiyan ji rêxistinên navneteweyî xwestin êdî bêdeng nemînin û xwedî helwest bin.

**Di 4'ê cotmehê de:** Yekitiya Bijîşkên Navneteweyî yên ji bo Pêşîgirtina li Şerê Nukleerê (IPPNW) li ser bikaranîna çekên kîmyewî ji aliyê dewleta Tirk ve, bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku derbarê de lêkolînê bike. Herî dawî Fermandariya Navenda Parastina Gel (NPG) beriya çend rojan bi daxuyaniyekê ragihand ku bi taybetî li qada Zendûra ya Metînayê û qada Girê Sor a li Avaşînê li gelek deveran çekên kîmyewî hatine bikaranîn.

**Di 2'ê cotmehê de:** KNK'ê li dijî êrîş û bikaranîna çekên kîmyewî ya ji aliyê dewleta tirk û bang li civaka navneteweyî, gelên herêmê, hemû kesên xwedî wijdan û exlaq kir da ku xwedî helwest bin. Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker-qirker û bikaranîna çekên kîmyewî ya li qadên gerîla daxuyaniyek nivîskî weşand.

**Di 1'ê cotmehê de:** Endamên Komeleya Pêşmergeyên Dêrîn yên Hizba Komunîst ya Kurdistanê diyar kirin ku herêm niha dibin destê hêzên navnetewî de ye, dewleta Tirk jî dibin destê wan de ye. Pêşmergeyan bang li rêxistinên navnetewî kirin da ku dijî bikaranîna çekên kîmyewî ku dewleta Tirk li hemberî gerîla bikartînin, bêdeng nemînin.

**Di 29'ê îlonê de:** HPG'ê diyar kir ku Tirkiye li dijî gerîla neçar maye û bi çekên kîmyewî bombardûmaneke giran dike. HPG'ê diyar kir ku berxwedana gerîlayan li dijî vê êrîşê bênavber didome.

## Banga 109 rewşenbîr û parlamenteran

Ji Kurdistan û Iraqê 109 rewşenbîr, nivîskar, parlamenter, rojnamevan û hîndekaran bang li Neteweyên Yekbûyî (NY) û Komîteya Rêveber a Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) kirin ku têkildarî bikaranîna çekên kîmyewî yên dewleta Tirk li herêmên Avaşîn, Zap û Metînayê dest bi lêpirsînê bikin.

Kesayetên Kurdistanî û Iraqî di 15'ê cotmehê de ji Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Antonio Guterres û Komîteya Rêveber a Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) re name nivîsandin û ragihandin ku artêşa tirk demeke direj e ji bo dagirkirinê li başûrê Kurdistanê operasyonan dike, giraniyê dide ser herêmên Avaşîn, Zap û Metînayê û hewl dide van herêman ji mirovan xalî bike.

Di nameyan de wiha hat gotin: "Artêşa Tirk ji sala 1983'yan û vir ve operasyonên leşkerî yên li derveyî sînor li ser xaka Iraqê dike. Operasyona ku 23'yê Nîsana 2021'ê dest pê kir asta herî dawî ya van operasyonan e. Her wiha asteke nû ya polîtîkayên herêmî yên Tirkiyeyê nîşan dide û Tirkiye dixwaze li Iraqê xaka Kurdan bi berfirehî dagir bike. Operasyonên leşkerî yên dawî bi taybetî li Amediyê, bejahiya Dihokê, herêmên Avaşîn, Zap û Metînayê hatin meşandin. Di encamê de gelek sivîlan herêm terikandin û ev herêm veguherîn zeviyên bêxwedî. Nêzî 40 sal in gerîlayên PKK'ê li vê herêmê ne û pêşî li pêşveçûna artêşa Tirk girtin."

Rewşenbîr û nivîskaran diyar kirin ku artêşa tirk a ku ji 23'yê nîsana 2021'ê û vir ve di êrişên dagirkeriyê de bi ser neketiye û li berxwedana gerîla asê mane, tê gotin ku çekên qedexekirî yên dikevin ber peymana Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) bi kar tîne.

Rewşenbîr û nivîskaran wiha gotin: "Artêşa tirk ku nikare xeta parastinê ya gerîlayan têk bibe, çekên kîmyewî serûber bi kar tîne û ev yek hem bandorê li gerîla hem jî li xelkê sivîl dike. Îdîa hene ku dibêjin artêşa tirk çekên ji aliyê OPCW ve hatine qedexekirin, bi cih kiriye. Ev îdîa bi dîmen û raporên cuda yên bi mehan e li medyayê têne weşandin, têne piştrastkirin."

Di nameyan de hat xwestin ku bi daxwaza OPCW û Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres, lêkolînerên serbixwe dikarin li



Avaşîn, Zap û Metînayê lêkolînê bikin û daneyên xwe kom bikin.

Di dawiya nameyê de ev tişt hat gotin:"Weke parlamenter, rojnamevan, rewşenbîr, aktîvîstên mafên jinan, aktîvîstên mafên mirovan û endamên civaka sivîl em bang li we dikin ku tavilê komîsyoneke serbixwe bişînin herêman û lêpirsînê bidin destpêkirin. Meşandina vê lêpirsînê ne tenê erkekî hiqûqî û saziyî ye, di heman demê de wezîfeyeke mirovî û exlaqî ye."

# Kî rewa ye?

divê em bibînin ku PKK û birêz Ocalan ji ber vê tunehesibandina kurdan a dewleta dagirker rabûn û li hemberî wê şerê hebûn û tunebûnê dan û didin meşandin. Bi saya PKK'ê û birêz Ocalan e ku Kiliçdarogluyê asîmîlebûyî îro hinek kurdan meşrû dibîne



Hisên Çatikkaş



Di roja me de peyv û têgeh li gorî kes, partî, îdeolojî, dewlet û hwd. tên guherîn. Her kesek an jî îdeolojiyek dikare têgehekê li gorî xwe pênase bike, bêyî ku li dîrokçe yan jî çavkaniya têgehê binihêre. Ev jî tevliheviyekê bi xwe re tîne ku ev tevlihevbûna têgeh û wateyên wan e. Lê di eslê xwe de têgeh an jî wateyên wan ne evqas tevlihev in. Ên ku tevlihev dikin, kes, partî, îdeolojî yan jî dewlet in. Ji ber ku ew dixwazin têgehan li gorî berjewendiyên xwe şîrove û pênase bikin. Dixwazin xwe wek ên herî demokrat, azadîxwaz, biedalet û rewa nîşan bidin. Di filozofiyê de têgeh pir girîng in. Lewra filozofên wek Deleuze û Guattarî dibêjin ku 'filozofî karê avakirina têgehan e.' Lê dema em li siyasetê dimeyzênin, siyaset dibe karê bikaranîna têgehan. Kî karibe çiqas têgehan şolî bikar bîne, ew kes ewqasî jêhatî û serkeftî dibe! Bêguman têgeh tenê têra serkeftin û jêhatîbûnê nakin. Lê têgeh di siyasetê de weke amûrekê tên bikaranîn. Di rastiyê de kesên otorîter, xwedîhêz an jî 'xwediyê dewletê'(!) vê yekê dikin. Kesên vê yekê dikin, 'legalîzma otorîter' ji xwe re kirine mertal û di bin navê hiqûq û dewletbûnê de xwe mafdar nîşan didin. Ev destpêk tev ji ber gotina serokê CHP'ê Kiliçdaroglu yê ku çend hefte berê li ser rewabûna PKK'ê û birêz Ocalan bû. Helbet heke em bi çavên Kiliçdaroglu û li gorî qanûnên dewleta wî ku kurdan bi tu awayî di nav xwe de nahewînin li ser meselê bifikirin, Kiliçdaroglu dê mafdar be. Lê li aliyê din rastî û heqîqet dê kenê xwe bi me bikin. Dema em li makeqanûna dewleta tirk bimeyzênin em ê bi tu awayî kurdan di nav de nebînin. Li gorî makeqanûna dewleta wî, kurd tune ne ku mafên wan hebin û rewa bin. Lê divê em bibînin ku PKK û birêz Ocalan ji ber vê tunehesibandina kurdan a dewleta dagirker rabûn û li hemberî wê şerê hebûn û tunebûnê dan û didin meşandin. Bi saya PKK'ê û birêz Ocalan e ku Kiliçdarogluyê asîmîlebûyî îro hinek kurdan meşrû dibîne, hinekan jî ne meşrû bi nav dike. Heke birêz Ocalan jî Kiliçdaroglubûn(!) qebûl bikira, bêguman dê li cem dewleta wî meşrû bûya. Lê ji ber ku rastî û heqîqetê li nav çavên Kiliçdaroglu û dewleta wî daye îro ji aliyê wan ve ne meşrû tê pênasekirin. Vêca em vegerin ser gotinên Kiliçdaroglu ku birêz Ocalan gelek caran gotibû. Kiliçdaroglu: 'Em dikarin pirsgirêka kurd bi HDP'ê re li meclisê (TBMM) çareser bikin.' Jixwe dema pêvajoya çareseriyê jî birêz Ocalan çend caran gotibû ku divê ev pirsgirêk li meclisê çareser bibe. Nexwe tişteke nû ya ku Kiliçdaroglu dibêje çi ye? Ka dê çawa çareser bike? Welhasil pirs zêde ne lê bersiv tune ne. Helbet kurd êdî bi hêsanî nabin nêçîra nêçîrvanan. Em dizanin ku dema nêçîrvan diçe nêçîrê bi xwe re gelek xefk û fêlan dibe. De vêca em ji nêçîrvan re bibêjin: Rojbaş...

Li gorî ferhengê peyva rewa di nav xwe de rastiyê, mafdariyê û qanûnîbûnê dihewîne. Wateyeke wê ya din tiştekî ku li gorî wijdana civakê be, meşrû ango rewa ye. Dema mirov analîza tiştekî bike, hewce ye ku mirov hemû wateyên wê li ber çavan bigire. Lê tenê ev pênaseyên li jor jî têra pûçkirina gotinên Kiliçdaroglu dikin. Ewilî em weke Kiliçdaroglu bifikirin ku li gorî qanûnên wan PKK û birêz Ocalan ne rewa ne. Baş e! Qanûn ên kê ne û kê ew çêkirine? Qanûn ji ber çi hene? Ji ber ku bersivên van pirsan beloq in, hewcedarî pê nabînim ku bersiva wan bidim. Heke mirov berê xwe bide wateyên pênaseya peyvê, em ê bibînin ku PKK û birêz Ocalan di çavên piraniya kurdan de mafdar in, li gorî wijdana civaka kurd tevdigerin û ji bo kurdan rastiyê diparêzin. Heke em weke Kiliçdaroglu bifikirin, divê em ewqasî xwe li erdê nexin, diviyabû li hemberî zilmkar û dagirkeran kesî serî hilnedaba ji ber ku yê qanûnan çêdikin ew in. Dema em li dîrokê jî binihêrin em ê bibînin ku gelek mirovan li hemberî qanûnên zilmkar û dewletan serî hildane ku yek ji wan Antîgone ye. Ev tragedyaya berxwedanê behsa têkoşîna di navbera edalet û qanûnan de ango têkoşîna di navbera Antîgone û Qral Kreon de dike. Li gorî fermana Kreon dide, diviyabû ji birayê Antîgoneyê yê mirî re tirb nehatiba çêkirin. Lê Antîgone li hemberî fermana ango qanûna Kreon derdikeve û ji birayê xwe re tirbê çêdike. Ji ber ku Antîgone bi zanebûn qanûnê bin pê dike û berpirsiyariya binpêkirina qanûnê bi awayekî aşkera werdigire ser xwe, lewra di dîrokê de wek yekem çalakvana bêîtaetiya sivîl tê qebûlkirin. Bi heman awayî gelek netew li hemberî qanûnên dagirkeran derketine û azadiya xwe bi dest xistine. Weke me li jor diyar kir HDP, PKK û birêz Ocalan ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd aktor in. Lê rolên wan ên cuda hene. Kesên dixwazin ev şer raweste, nikarin wan her sê hêzan ji hev cuda bikin an jî divê nekin. Çawa em li mirovekî/ê bimeyzênin, em nikarin bêjin ev dest, ling, serî yan jî zik e, ew jî tiştek e wiha ye. Wek mînak; em dikarin Hindistana di bin dagirkeriya îngilîzan de doza serxwebûnê dikir, bigirin dest. Wê demê li Hindistanê du aktorên bihêz hebûn ku bi awayê cuda li hemberî dagirkeriyê têkoşîn dimeşandin. Yek ji wan ku Gandhî pêşengtiya wê dikir, bi çalakiyên bêîtaetiya sivîl li ber xwe didan û dixwestin dagirkeran ji welatên xwe derînin. A diduyan jî aliyê çekdarî bû ku dixwestin bi şerê çekdarî dagirkeran ji welatên xwe derînin. Li gorî hinduyan her du jî rewa û berxwedêr bûn. Divê em ji bîr nekin ku dagirker bi dilê xwe ji welatê dagirkirî dernakevin. Lewma her cureyê têkoşîna li hemberî dagirkeriyê, li gorî neteweya ku welatê wan hatiye dagirkirin, rewa ye. Ji ber vê yekê li gorî kurdan HDP, PKK û Ocalan di çareserkirina pirsgirêka kurd de aktorên meşrû ango rewa ne. Yên li Kurdistanê ne meşrû nin bêguman dagirker û hemû amûrên wan ên şer in. Lewra weke Arjen Arî gotiye 'Hûn ê biçin, hûn ê pişta stûyê xwe bixurînin û biçin.'

# Jiyana li dijî heqîqetê înkara jiyanê ye

Salîh Keleş


Di nav gerdûnê de teşeyeke jiyana hemû cureyên zindiyan heye. Teşeya jiyanê 'xwebûn'a wî/wê zindîbûyînê diyar dike. Ji ber wê, ji bo her cure zindî teşeya jiyanê dibe heqîqeta wî/wê zindîbûyînê. Çi qasî li gor wê teşeyê tevbigere ewqasî heqîqeta xwe pêk tîne.

Heqîqet, cewher e. Di gerdûnê de her tiştek destpêkeke wî/wê heye. Ji bo zindîbûyînê jî destpêk dibe heqîqeta wan. An jî mirov dikare heqîqetê wekî pêkanîna li gor pêdiviyên jiyanê bi nav bike. Çiqas li gor pêdiviyê teşeya jiyana xwe tevbigere ewqasî heqîqeta xwe ava dike. Nejiyana li gor heqîqeta xwe, înkara jiyanê ye.

Di nav fezayê de çend cure zindîbûyîn hebin ewqas heqîqet hene. Heqîqeta cureyê zindiyekê/î nabe heqîqeta cureyeke din. Lê di nav heman cure zindîbûyînê de heqîqetên cuda çênabin. Ji ber wê ji bo her cureyekî heqîqet divê bi temamî bê destgirtin.

Di vê çarçoveyê de heqîqeta mirov divê çawa were pênasekirin an jî heqîqeta mirov çi ye? Beriya ku em vê pirsê bibersivînin divê neyê jibîrkirin ku di nav gerdûnê de mirov jî parçeyeke ji gerdûnê ye. Gerdûn hemû nîne. Tişta ku di roja me de şaş tê zanîn û rê li ber hemû kêmasiyan vedike ew e ku mirov gerdûnê wek milkê xwe dibîne û di xwe de mafê mudaxeleya her tiştî dibîne. Di gerdûnê de derketina zindîbûyînê bi serê xwe mijareke din e. Lê wek ku tê zanîn ji bo jiyana zindiyan sê taybetmendiyên sereke hene. Debar, parastin û zêdebûn. Ev her sê taybetmendî ji bo hemû zindiyan wek ajoyên hundirîn tên jiyîn. Beriya mirovahiyê jî cureyê zindîbûna mirov wek prîmat tê pênasekirin. Prîmat, serdema beriya mirovahiyê ye. Wê demê prîmat jî wek zindiyên din jiyana xwe bi tevgerandina ajoyên hundirîn pêk tîne. Ji bo wê yekê jî ji prîmatan re nabêjin mirov.

Di xwezayê de heya niha 4 demên guhertina avhewayê pêk hatine. Her guhertina avhewayê li ser jiyana zindiyan jî guhertinên esasî pêk tîne. Gelek cureyên zindiyan ji ber ku xwe li gorî guhertina avhewayê neguherine wek cure ji holê rabûne. Yên ku guhertin li gorî şertên avhewayê pêk anîne jiyana xwe jî berdewam kirine. Serdema çaremîn a guhertina avhewayê ji bo gelek zindiyan bû sedema guhertinên bingehîn. Ji bo prîmatan jî bû serdema man û nemanê. Heya wê demê prîmatan jiyana xwe bi awayekî tevgerandina ajoyên hundirîn pêk dianîn. Erdnîgarî û xwezaya wê demê ji bo jiyana zindiyan a rojane guncav bû. Ji bo jiyana xwe berdewam bikin hewldaneke cudatir ne hewce bû. Piştî vê guhertina avhewayê ew şertên ku di xwezayê de heyî ji holê radibin.



Di her cure zindîbûyînê de wek ajoyekî hundirîn ji bûyînê de mekanîzma xweparastinê heye. Ên ku ji bûyînê de ev mekanizmaya wan tune ye mirov in. Ji ber vê em dibêjin di vê serdemê de (serdema çaremîn) prîmat bi man û nemanê re rû bi rû man. Ji ber ku êdî ew derfetê ku xweza ji bo jiyana xwe berdewam bike nade. Di nava şertên xwezayê de zindiyên herî qels û bêparastin prîmat in. Mekanîzmaya wan a parastinê tune ye, di nav xwezayê de bi tena serê xwe nikarin jiyana xwe berdewam bikin. Vê qelsiya xwe û tenêbûna xwe bi hatina cem hev, wek kom tevgerandinê dixwaze derbas bike. Destpêkê hatinacem hev û wek kom tevgerandin çiqas bi zanebûn bû ne diyar e jixwe. Ew lêgerîna berdewamkirina jiyana xwe dibe pratîkeke wisa. Prîmat di serdema ku man û nemanê de dijîn bi avakirina klanê xwe rizgar dikin. Klan guhartineke çawa dide avakirin? Ji vir û şûnde jiyana prîmatan çawa berdewam dike? Û destpêka mirovahiyê li ser kîjan pîvanan pêk hatiye? Di nivîsa xwe ya pêş de em ê van mijaran binivîsin.

# Faşîzm hêzê cinîyan ra terseno

Meral Kuçuk



Dîna de kotî beno bibo, wayîrê kamci ziwan, îtîqat, netew bibê, duwel onca ki heqa cinî ci nêdena. Kamcî welat de niyadîme, uca de cinîyan ser zorvajîye esta. Duwele ke xo bi demokrasîye name kenê înan de kî seba cinîyan qeraran oncîna en zêde camêrdî danê. Hema beno ke vajîme dîna de jê kurdan canikî çin ê ke hem binê zilm zorvajîya girane der ê hem kî duştê naye de xoverdayîşêdo girs danê. Tirkîya de cinîyan tayê raye girewtîbî. Game bi game, roje bi roje, bi têkoşînî û xoverdayîşî tayê heqî girewtîbî. Hema huqmatî mavênê çend serran de lete bi leteyî nê heqan rê hêrîş kerd. Ju bi ju vurnayî û nê heqî destê cinîyan ra girewtî. Weşîya cinîyan ser o tena camêrdî qisey kenê. Sîstemê ewroyinî dahîna zêde camêrdî vetî vernîye, bi na raye cinîyan ser o dahîna zêde zorvajîye kenê.

Cinîyê ke verê nê sîstemî de bêveng nêvindenê, serva heqanê xo, serva têduştîye, haştîye erzenê xo ver, dûştê zilmê îqtîdarî de vindenê rastê herîşanê giranan yenê. Ya karî ra yenê eştene, ya kî erzîyenê hepisxane.

Ewro cinîyanê kurdan her hetî ra xo aver berdo. Xo bi rêxistin û perwerdeyî resnayo. Her ca de wayîrê qesaya xo yê. Têkoşîn û xoverdayîşî de cinîyî vernîye de ca gênê. Her cayî de serva ca ardena weşîyêda azad cinî rolêdo pîl girewta xo ser. Bi xoverdayîşê cinîyan vejîno werte ke şar kî xo ver dano, naye rê rayverîye cinîye kena. Coka ewro hendê cinîyî yenê hedef girewtene. Nînan juye ke Vervatoxa Demî yê TJAye Ayşe Gokkan a. Nêzdîyê 9 aşmî yo ke hepis de ya. Ronîştena dewaya peyêne de 30 serrî ceza ci rê ameye birnayene. Tena Ayşe Gokkan zere de nîya, bi seyan cinîyî ewro zindanan der ê. Zindankerdişê cinîyan bi yew konseptê taybetî yeno kerdene. Cinîyê ke ewro rayverîya xoverdayîşî kenê, bi pêgirewtîşê înan wazenê ke waştena azadîya şarî gigêrê binê bandora xo. Zanenê ke cinî ewro ustina têkoşîna azadîya şarê kurd a. Rayverîya xelasîyayîşê hem yê cinîyan hem kî yê yew netewî kenê. Bi Ayşe Gokkane rê ceza dayene reyde, îqtîdarê AKP-MHP wazeno ke kurdana bitersno û bigêro binê bandora xo, xof zereyê însanan ca bikero û bi na raye ke înan rê peyser game eştene bidero. Bi pêgirewtîşî û cezayanê giranan hareketê cinîyanê kurdan hedef gênê.

Bi des serran o ke dewlete na polîtîkaye dana ramitene. Kurdî tena ewro nê serranê 80 û 90an de kî bîyî hedef. Teber de zîndanan de herîşê cinîyan kerde. Bi kiştene, tacîz û tecawizî waşte ke cinîyan bêveng bikerî. Nika kî bi nê herîşanê cinîyan ser o ju homet, ju têkoşîn û ju şarî hedef gênê. Bi nê cezayan wazenê ke têkoşînê cinîyan bêqewet û teyna bikerî. Nê herîşî, verba weşîyêda azad, verba waştena xelasîyayîşî û verba ca ardena ciwiyayîşê têduştî yê. Verba xoverdayena cinîyanê kurdan ê. Se kenê bikerê, bese nêkenê vernîya cinîyan bigêrê, vernîya vengê azadîye bigêrê, qewetê xo rêxistin kerdene bigêrê. Bese nêkenê biresê armanca xo. Cinîyan ewro hem xo nas kerdo hem kî rastîya sîstemê camêrdîye. Fam kerdo ke raya xelasîyayîşî kamcî ya. Coka ke na raye de şonê, serva azadîye bi qerarîye ceng danê. Cinîyê kurdan, cinîyê xoverdayoxî qet vilê xo çewt nêkenê, her ca de vengê azadîye, xoverdayene û têkoşînî berz kenê. Cinîyê kurdî, roja verêne ra heta roja ewroyine peyser gamî nêeştî. Nêvato "bes o" ne kuçeyan ra peyser ancîyayî, neke qesaya xo ra apey mendî.

# Vîrê kurdan û pêşengehê Ahmet Guneştekînî



Mahîr Uzmez

Yew hewte over Amed de pêşengehê Ahmet Guneştekînî ê bi nameyê 'Odaya Vîrî' ame akerdin. No pêşengeh heta name, naverok û şexsîyetê ke tewrê ci bîyî zaf ame rexnekerdin. Naverokê nê rexneyan de tewr zêde nizdîbîyayîşê dej û vîrî ê kurdan est bî û rexneyî zî zaf ca de bî. Heta enka zaf tenê ke qet alakaya înan bi dej û vîrê kurdan çinî bi qalî kerdî, la belê fikir û rexneyê şarê kurdî no pêvajoyî de bi sîstematîk nêameyî nuştin. Ez no nuşteyê xo de hewl bida nê rexneyan bi hewayêko sîstematîk raya pêroyên reyde par bikera.

Ahmet Guneştekîn sey yew hunermendêk kurd yeno şinasnayîş. Heta enka beşa wêneyî de kar û xebatan kerdo. Nê serranê peyênan de bi yew hewa tekilîya ci bi Tirkî-Sipîyan reyde vêşî bî. Ahmet Guneştekîn 23ê nîsana 2020î de semedê roja akerdina meclîsî yê tirkan yew vîdeo-klîp zî viraşt bî û par kerdî bî. Nuştoxê Hurriyetî Ertugrul Ozkokî zî 24ê nîsana 2020î de koşeyê xo de no vîdeoyî rê spasîyê xo Ahmet Guneştekînî rê kerd. Merdim şêno mînakanê winasîyan vêşî bikero. Ez bawer kena bi no mînake terafê Ahmet Guneştekînî wendoxanê ma rê bida fehmkerdin.

No bingehî reyde Ahmet Guneştekîn Amed de sûka sûrî mîyan de yew pêşengehê bi nameyê "Odaya Vîrî" akerd. Ahmet Guneştekînî enawa yew pêşengehêk bi kamî meksedî akerd, ay hema nîno zanayîş... La belê ay dîmenê ke akerdişî de vejîyayî werte xo reyde meksedê no pêşengehî de yew fikir da şarê kurdî û rexneyê serê peşengehî zî bingehê xo ewtara gênê.

Vîrê kurdan de tena dej esto û dej reyde nîno kaykerdene...

Ma verê heme çî bi nameyê pêşengehî "Odaya Vîrî" dest bikerê. Vîrê yew civako ke sey civak yeno zanayîş "HAFIZA" yê ay ciwakî yo. Vîrê kurdan de zî tena tertele, kiştiş, tepiştiş, îşkence û surgun esto. Coka wexto ke qala no pêşengehî ame kerdiş heme kes paweyê nê buyeran bî. La belê pêşengehî de bi tabutê rengînan ame no wate; sankî kiştişê kurdan yew çîyo weş û rengîn o... No zî qîm nêkerd tayn meymanî vernîya nameyê şehîdan û vernîya nê tabutan de fotograf antî û seke çîyêko weş o medyaya dijîtalî de bar kerdî. Reyna mêymanê ke ameyî dawetkerdin mîyan de pêro zî sîyasetmedar, nuştox, rojnamevanê ke eleqayê înan qet bi dejê kurdan çinî yo bî. Hele ay govend û muzîk zî semedê şarê kurdî bî dilopa peynî!

Ez wana ke; dejê kurdan Almanya de, Azerbaycan de, Stenbol de zî kes niştio bi saz û govend bîyaro têhet. Hele yew cayêko sey Sûrî de ke hema zî boya qetlîyamî ci ra yena de merdim qet niştê bi saz û govende kar bîyaro. No kiryar verva heme çî dejê şarê kurdan rê bêhurmetî yo.




Verva nê bêhurmetî şarê kurd taybetî zî ciwanê kurdan verva nê pêşengehî vanê ke; "Oyta de yew pêşengeh nêame akerdin, oyta de xîyat bi heme nirxê şarê kurd û şarê Amedî yeno kerdin. Tabutê ke ameyê amadekerdin, kiştinê bê faîlê yê. O wext Wezîrê Karê Zereyî Meral Akşenere hem qetlîyam serê şarê kurdî de viraşte, hem zî erşawitina çelengê xo reyde nê cinayetan pîroz kena. Reyna roja ke muzîk û kulturê kurdan yeno qedexekerdin, no pêşengeh bi muzîk û govende yeno akerdin... Eke şima raştîra yew VÎRÎ geyrenê, tena dêsê Sûrî yê Amedî ra boynîyê bes o."

Enka heme şarê kurd no persî perseno; enasar yew pêşengeh bi no hewa qey ame akerdin?

Werte de yew çîyêko eşkere esto. Ahmet Guneştekîn bi no pêşengehê xo dejê şarê kurdî nêardo ziwan, bi no pêşengehî dejê şarê kurdan maseya Tirkê-Sipîyan de kerdo mezeyê keyf û sefayî. Yew wa xo rê meydan veng nêveyno û bi hesabê şinikan nizdîyê nirx û rumeta şarê kurdan nêbo. Şarê kurd hema zî şêno bi rayîr û rêbazê demokratîkan wayîrê nirxanê xo vejîyo.

Şarê kurd bê wayîr nîyo...

## Dewlete bîya dişmena verêne ya cinîyan




Vervatoxa Meclîsê Cinîyan ya Partîya Demokratîke ya (HDP) Ayşe Acar Başarane merkezê pêroyî yê partîya xo de kombîyayîşê çapemenîye da. Başarane verî cezaya ke dîyabî Vervatoxa verêne ya Têgêrayîşê Cinîyan yê Azadan (TJA) Ayşe Gokkan şermezar kerde û va: "Seke Qirkerdişê Pirsûsî de qewimîya pê polîtîkaya bêcezaverdayîşî failî kerdî pakî. La ma do têkoşînê xo ra fek vera medê û edalet bîyarê ca. Goreyê çapemenîye 10 menganê 2021î de 234 cinîyî ameyî qetilkerdene. Amed de domanêke maruza tacîzê kesê V.B. bîye. La muhakemekerdişî ancî camêrdî pawitî û V.B. vera da. Mevlude Akguna ke vera şîdetê heqê xopawitîşî şuxilnabi rixmê nêweşîya xo vera nêdîyaye. Reyna Çileme Dogan rê cezaya zîndanî ya 15 serran yena waştene. Dewlete pê hêzanê asayîşî û muhakemekerdişî camêrd o û bîya dişmena verêne ya cinîyan. Ma do Peymana Stenbolî ra qetî fek vera nêdê û têkoşînê xo rê dewam bikerê." ***ANQARA***

## KAYY-DER: Çewlîg de qirkerdişo ekolojîk esto

Çewlîg de serranê 90an ra nata pê HESan şaristan rijîyayîşê ekolojîkî reyde têrî mend. Pê 7 awbend û 6 HESan erazîyê zîretî binê awe de mendî. Wextanê peyênan de zî pê şewatê daristanan xozaya Çewlîgî çin bena. Hemserekê Komeleya Kultur, Hetkarî û Averberdişî ya Gêxî, Depe, Azarpêr, Xorxol û Çerme (KAYY-DER) Ahmet Tuzunî derheqê babete de qisey kerd.

Tuzunî da zanayene ke HES û awbendî awhewayî vurnenê û vat: ''Herêma ma de nînan ra semed ziwatîye esta. Pê projeyanê winasênan şaristan de zîret û heywankarîye yenê qedînayene. Merdimî bi nê hawayî mehkumê qoricîtîye yenê kerdene yan zî binê nameyê 'hetkarîya sosyale' de pabesteyê dewlete yenê kerdene.''

Tuzunî bale ant ser ke Çewlîg de verî ke 'Raporê Ercnayîşanê Tesîran ê Dormekîyan' (ÇED) şîrketî ruhsatê madenî gênê û vat: ''Selahîyetdarê ke tayînê şaristanî benê wina zerarêkê pîlî danê şarî. Goreyê ÇEDî ganî verê projeyêkî rizaya merdiman bêra girewtene. Wezîrîya Daristanan û Zîretî şaristan de îhaleya seydwanîye akena. Çewlîg de seydwanê qeçaxî gêrenê. Dewlete firsend dana înan, Peymana Bernî binpay kena. Birnayîşê daranê ma versîyonêkê polîtîkaya 'bêmerdimverdayîşî' yo. No halo peyên ê qirkerdişê ekolojîkî yo.'' ***ÇEWLÎG***



# Tu bi qurbana zarokên xelkê bî

Macid Yusif

Çîrokeke hinekî dirêj e, heke karê te tune be bixwîne û heke karê te hebe hema dev jê berde. Carekê ez hîna biçûk bûm, ez ji firinê bê nan vegeriyam malê. Diya min got: "Lawo tu bi qurbana zarokên xelkê bî. Zarokên xelkê pîç in ê me kerpîç in." Diya min piştî van gotinan pişta xwe da min û karê xwe yê malê berdewam kir. Ez gelekî aciz bûm, min destên xwe şidandin, serê xwe hevraz kir û bi hemû dengê xwe qîriyam û min got: "Aaaaaaaaaaaa."

Piştî wê tevgerê min biryar da ku ez jî bibim wek zarokên xelkê. Gava pêşî, min xwe aciz kir û pihîna xwe li koma cilan da. Di binê koma cilên diya min danîbû hewşê de kevirekî mezin hebû û xwînê di serê neynûkên lingê min re avêt. Min dîsa kir qîrînî û min deriyê hewşê bi hêrs vekir lê derî li nav guhê min ket û ez bi paşve li erdê dam. Diya min berê xwe da min û got: "Xwelî sero nizane aciz jî bibe, bi qurbana zarokên xelkê bûyo."

Min hawar û gaziya xwe berdewam kir û ez derketim kolanê. Min dît ku Heseno li wir rûniştiye. Ez çûm û min jê re got: "Ez dixwazim bibim wek zarokên xelkê." Heseno got: "Were dermanê te li ba min e." Em çûn dikanê me 2 cixare kirîn û li ser kolanê me dûman bi ser xwe xist. Bû ihtezirta min. Heseno got: "Xem nake tu yê zû bielimî û ez ê di çend rojan de te bikim wek zarokên xelkê."

Piştre Heseno got: "Temam ka em herin qada gogê wa ye çend zarokên bajarî li wir bi gogê dilîzin." Em çûn ba wan zarokên bajariyan û Heseno ji min re got: "Here lîstika wan xera bike." Min got: "Na lo guneh in." Hesano got: "Mêro hem tu dibêjî ez dixwazim bibim wek zarokên xelkê û hem tu bi ya min nakî."


Ez çûm û heta ji min hat min pihînek li goga wan da û gog çû û hey çû. Hew min dît hema tevan bi hev re êrîşî min kir. Min bazda û wan jî wek mêşên hingiv tevan li pey min bazdan.

Ez bêhnçikiyayî giham ba Heseno, min jê re got: "Wa hatin rabe alîkariya min bike." Heseno got: "Na na tu dixwazî bibî wek zarokên xelkê divê tu baz bidî. Baz bide û xwe xelas bike, çênabe ez alîkariya te bikim."

Her ez dibêjim lawo Heseno gihîştin min wê tev li min bicivin, were min xelas bike. Lê haya Heseno ji bayê felekê tune ye û wekî ku min nas nake tevdigere.

Werhasilî ez dirêj nekim zarokê bajarî li min civiyan û têra min li min dan. Ser û lingên min di nava xwînê de man. Heta ez vegeriyam malê dinya reş bibû, deriyê hewşê girtî bû. Min got bila kesek bi min nehise. Min li derî neda, min xwe di ser dîwarê hewşê re avêt hundir. Ez bi ser dara gulên muhemedî de ketim û laşê min tijî derziyê gulê bûn.

Min ji êş û hêrsa xwe dîsa kire qîrînî û got: "Aaaaaaaaaa. Malbat tev bi ser dengê min ve hat hewşê ku çi bibînin, ez di nava xwînê de mame. Diya min her du destên xwe dan kêleka xwe û got: "Weyla lawo Macido ez xêrê ji te nebînim û tu qurbana zarokên xelkê bî."




# Tiştanok (mamik)



**1-**Erd spî ye
Tov reş e
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Periyên wê hene
Lê nikare bifire
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**


**1-** Mektûb, name **2-** Aş

# Ma ez birçî bimirim ?

Mirovek ji dinyayê aciz bûbû û kul û derdên wî yên bê çare û giran hebûn. Biryara xwe da ku xwe bikuje. Mêrik çû li ser rêhesina trênê rawestiya û li hêviya trênê bû. Mirovek hat, jê re got: "Xêr e tu çima li wir rawestiyayî." Got: "Ez dixwazim xwe bikujim." Mêrik got: "Lê ew çi tûrik e li milê te." Got: "Ew hinek xwarin marin e." Mêrik got: "Tu hatiyî xwe bikujî lê çi dikî ji xwarinê." Bersiva wî da û wiha got: "Kuro lawo ma belkî trên dereng hat, ma çavên te lê ye ku ez li vir ji birçînan bimirim."




# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Taxeke Amedê 3. Qul 5. Du zarokên ku bi hevre jidayik dibin6. Paytexta Îtalyayê
7. Navekî pêşiyên kurdan ê kevnar 9. Teşwîqkirin 12. Ne tijî, kêm
14. Sewaleke kedî ku ji bo hirî û goştê wê tê xwedîkirin 15. Dîndarî
17. Mûyên bi çena mêran ve 18. Daçekek
22. Xwarineke gelêrî ya kurdan, herî zêde di nava gerîlayan de tê bikaranîn

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Raz
2. Fikir
3. Cînavkek
4. Tûj
5. Alava ku berê dan tê de dikutan
7. Alî û cihê herî bilind ê mizgeftê
8. Lebata xwarin û vexwarinê
10. Teref, hêl
11. Dadwer
13. Afirande, tiştekî nû çêkirî afirandî
14. Celebekî moriyên ji kevirên giranbuha
16. Best, rastehî
19. Bersiva erênî
20. Amûreke mûzîkê
21. Daçekek
23. Amûreke mûzîkê ya têlîn

## Bersiva hefteya borî

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 Ş | A | 2 M | | | | | | 3 T | A | 4 R | |
| E | | O | | | 5 B | E | R | Î | | E | |
| 6 R | O | V | Î | | O | | | | | | |
| | | I | | | T | | 7 H | Ê | 8 L | | |
| 9 B | 10 E | K | O | 11 T | Î | | Î | | A | | |
| | R | | | A | | | 12 N | A | L | 13 Î | |
| 14 Î | D | | | L | | | B | | | L | |
| B | | | 15 D | Î | 16 N | B | Û | N | | O | |
| 17 A | V | | | | A | | N | | | 18 N | 19 A |
| D | | | 20 Î | | M | | | 21 Î | | | R |
| E | | 22 E | R | D | E | 23 W | A | N | | | D |
| T | | | O | | | E | | | | | |

# ‘NÇM mala me û huner jî çeka me ye’

■ Agrîn Cûdî

**Hunermendên NÇM’ê li dijî qedexeyên li ser hunerê derketin kolanan û qedexe nas nekirin. Hunermendan anîn ziman ku dê her derê bikin qadên hunerê û bi hunera azad pêşengiyê bikin**



Hunermendên Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM), piştî stran û şahiyên wan hatin qedexekirin, li Stenbol û Amedê şahiyên xwe li kolanan berdewam kirin. Hunermendên NÇM’ê Talat Yeşîl anî ziman ku dê li her derê hunera xwe berdewam bikin û her maleke wan ji bo çand û hunera wan dibistanek e.”

Di 16’ê cotmehê de Qeymeqamiya Kadikoyê şahiya NÇM’ê qedexe kiribû. Dîsa di heman rojê de Walîtiya Amedê strana Devrîm Demîr a “Tu kî yî” qedexe kiribû. Hunermendên Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) bi minasibeta 30’emîn salvegera damezirandina xwe li dijî qedexeyan çalakî û şahiyên xwe li kolanan berdewam kirin. Hunermendê NÇM’ê Talat Şahîn anî ziman ku polîtîkaya înkar û îmhayê ya li dijî çand û ziman ji avakirina komarê ve didome û niha derketiye asta jor.

Talat Yeşîl da zanîn ku di salên 1990’î de ji ber bişaftina li ser ziman û çanda kurdî di asta herî jor de bû, NÇM hat avakirin û wiha got: “Wê demê pergalê gelek stran û berhemên kurdî wergerî tirkî kirin û di arşîvên TRT’yê de qeyd kirin. Di salên 1990’î de çend zanyar û rûsipiyên kurd ên wekî Mûsa Anter, ji bo rê li pêş bişaftin û asîmîlasyona çand û ziman rawestînin NÇM ava kirin.”

Yeşîl bal kişand ser pêvajoya salên 90’î û wiha axivî: “Wê demê gel li çand li saziyên xwe xwedî derketin. Çiqas xwe gîhand gel û girseya wê mezin bû, pergalê jî ew qas êrîşên xwe zêde kir û xwest tune bike. Di vê pêvajoyê de bi sedan hevalên me hatin girtin û hinek ji wan hatin qetilkirin. Gelek hevalên me neçar man biçin Ewropa. Hinek ji wan çûn qadên azad. Şehît Hogir û Şehît Serhat hinek ji wan bûn. Heta îro jî girtin û binçavkirin didome.”

**Astengiyên li ser çand û ziman**

Hunermend Yeşîl, li ser astengiyên li pêş hunerê rawestiya û wiha got: “Astengî didomin. Ger ku îro jî derfetên wan hebin destûr nadin stranên kurdî bên strîn û gotinek kurdî bê gotin. Îro jî çend ciwanên kurd dixwazin li kolana Îstîklalê bi estrumanên xwe stranan bêjin. Lê polîs an jî zabita tên enstrûmanên wan dibin û dişkînin. Konserên me têne astengkirin. Ji sed konserên me 10 konserên me tên astengkirin. Dema destûr didin jî gelek astengiyên fîzîkî derdixin. Ger ku stran ne li gorî wan be dozê li me vedikin. Ji ber vê yekê her hevalekî/e NÇM’ê gelek doz li wan hatine vekirin.”

**Wekî ya xwe nîşan didin**

Yeşîl li ser polîtîkayên bişaftinê jî rawestiya û wiha berdewam kir. “Hin êrîş û astengî hene ji bo wan xebatek demdirêj dixwaze. Gelek stran, helbest, pirtûk, destan û dengbêjî bi şiklekî hatine dizîn. Pergalê wan wekî malên tirkî nîşan dane di arşîvên TRT’yê de cih digirin. NÇM bi xebata ‘Şahiyên Stranan’ çend rêzepirtûk stranên ku ji kurdî wergerî tirkî kiribûn, dîsa ew stran li ser reseniya wan vegerandin. Xebatên li dijî van bişaftinan didomînin.”

**Em ê li qadê bistrin**

Hunermend Yeşîl bal kişand ser qedexe û astengiya Qeymeqamiya Kadikoyê û wiha dirêj kir: “Trajedîkomîk e. Dema mirov kûr binêre, polîtîkayên taybet hene. Qebûlnekirina çand û siyaseta kurdî heye. Di bin vê astengiyê de nijadperestî heye. Ev encama înkara salan e. Ev qedexe asta herî jor a înkar û imhaya çand û zimanê kurdî ye. Ev ne jî bo berjewendiyên gelan e. Ev ne ji bo ewlehiya civakê ye. Bi salan in em li dijî vê nijadperetiyê rû bir û dimînin. Ev ne surprîz bû. Ew vê salonê qedexe bikin, têkoşîna me dê li salonek din bidome. Duh me stranên xwe li meclîsê gotin. Ew kolanê li me qedexe bikin em ê li kolanê starên xwe bibêjin. Ew kolanê qedexe bikin em ê li daristanan bistrên. Em ê li malan stranan bistrên. Gelê me li ku be em ê têkoşîna xwe li wir berdewam bikin. Her maleke me ji bo çand û hunera me dibistanek e. “

**Çeka me hunera me ye**

Talat Yeşîl, helwesta pergalê bibîr xist û wiha got: “Pergalê li her derê em dorpêç kirine. Dijmin hatiye ku me bifetisîne. Çeka me ya herî xurt amûrên me ne. Tembûra me ye. Stran û şanoya me ye. Em dixwazin amûr û hunera xwe wekî çeka herî mezin bikar bînin. Bi vî awayî em konseran çêdikin. Em şahiyan çêdikin. Em bi vî awayî li ser piyan dimînin. Wekî NÇM’ê bi sedan hunermendên me yên nû hene di nava gel de. Em bi projeyan, bi album û klîban dixwazin van astengiyan vala derxin.”

**Xetereyên li ser çandê**

Yeşîl, xetereyên li ser çand, huner û ziman jî bibîr xist û wiha bilêv kir: “Pergal bi xalên çand, huner û ziman hewl dide civakê ker, kor û lal bihêle. Ji bo civak bê reng bimîne, dixwaze bê çand, huner û ziman bimîne. Nirxên herî pîroz ên gelan dayik û jin in. Jina kurd êdî têkoşîna vîna azad di asta jor de li her derê pêş dixe. Ji bo pergal vê yekê qebûl nake li her derê êrîşî vîna jina azad dike. Ji ber ku jin bingeha çand, ziman û hunerê ye, êrîşî jinê dike. Jin koka çand û ziman in. Yek ji êrîşa din jî êrîşa li dijî ziman e. Yek ji çeka herî mezin ku huner û wêje pê tê afirandin ziman e. Xala sêyemîn jî hunerê asteng dikin. Konseran qedexe dikin. Gelek caran bi destê pergalê qedexe dikin. Gelek caran jî bi destê hişmendiya para xwe ji sîstemê girtiye tê qedexekirin. Dîsa ciwanên kurd ên ne di ferqa hunera kurdî de ne, ji bo populer bibin li ser medya dijîtal, hunera kurdî li gorî xwe derdixin pêş. Ev jî qetilkirina çand û hunera kurd a bi destê ciwanên kurd ên hişmendiya hunerî bi wan re kêm e. Ev jî polîtîkayên pergalê ne. Li dijî vê yekê têkoşînek yekpare lazim e.”

**Dema hunerê biafirîne hunermend e**

Yeşîl, herî dawî li ser afirîneriya hunermendan jî rawestiya û got: “Pirsgirêka herî mezin a huner û hunermendên kurd dijîn neafirandin e û xwedubarekirin e. Hunermend dema hunerê diafirîne hunermend e. Dema huner afirand dikare pêşengiya gel bike. Dema hunermend neafirîne xwe dubare dike. Ji bo hunermendek pêşengiya gel bike divê xwe dubare neke û biafirîne. Îro gelek lehengiyên mezin derdikevin pêş. Eger hunermend nikaribe lehengî û têkoşîna pêş dikeve bîne ziman û biafirîne, wê demê lingê wê hunerê û şoreşê lawaz dimîne. Divê hunermendê kurd li dijî vê polîtîkaya bişaftinê raweste. Divê stran, helbest, pirtûk û gelek berhemên din biafirîne. Di tekoşîna azadiyê de pêşketinek mezin heye. Divê hunermend jî li gorî vê yekê biafirîne. Îro hunermendên kurd ji xwe dûr ketine. Ji nirxên xwe dûrbûnek heye. Ev jî xeteriyek e. Ji ber vê yekê gel rexneyek mezin dike.”

# Serdest êşên bindestan estetîze dikin

Salîha Ayata

Piştî şerê Surê û qedexeyan, ketina Birca Keçiyê hatibû qedexekirin û ev pênc salbûn ku qedexeyê berdewam dikir. Lê piştî pênc salan di 16 ê îlonê de ji bo pêşengeha wênesaz Ahmet Guneştekîn qedexeya Birca Keçiyê hat vekirin. Ji bo gel nehat vekirin ji bo pêşangeha Ahmet Guneştekîn hat vekirin. Navê pêşengehê ‘Jûra Bîrê’ bû, lê piştî hat vekirin rexne û gengeşiyên mezin jî bi xwe re anîn. Di pêşengehê de enstalasyona; Alfabeya Winda, Dîwarê Dayikan, Hûn Tunebûn, Girê Bîrê, Rizîn, Korîdora Hejmara Pêncemîn heyî, hat pêşkêşkirin.

Ev pêşengeh berê li Ewropa û bajarên Tirkiyeyê hat vekirin lê nebû mijareke gengeşiyê. Lê li Amedê gelek mijarên gengeşiyê bi xwe re anî. Ji ber ku xwediyê pêşengehê got ‘ez hatim mala xwe û ez ê qala bîra kurdan, êş û elemên kurdan bikim.’ Helbet bîra kurdan xurt e û tenê di demên nêzîk de di bîra dîroka tije şer, berxwedan û îxanet; heta niha her çiqas zimanê wan hatibe qedexe kirin jî tim bi rêya devkî, bi awayekî xurt derbasî nifşên nû bûye. Hê jî kurd ji bo lêkolînên dirokî, çandî û hunerî berê xwe didin aqilmendên xwe yên wek kal û pîrên xwe. Ji ber ku civaka kurd van kesan wek dîrokeke zindî dibînin.

Tê zanîn ku di hêla nivîsîn û asta tê xwestin de hê jî gelek berhem kêm in. Ji ber vê yekê gelê kurd vê baş dizane ku divê hertim xwedî bîreke ku bi tu awayî li gor xwestina serdestan neguhere û teşe negire de kurd zimanê xwe, nasnameya xwe ji bîr nekin û hişmendiya serdest bi wan ne de jibîrkirin. Li hember vê xetereyê kurd tim xwedî bîreke xurt bûn û zû bi zû ji bîr nakin. Di bîra wan de windabûyîn, şer, êş, berxwedan, têkoşîn û îxanet jî heye…

Pêşengeha ku bi angaşta ‘hunera êşê û bîrê’ derdixe pêşberî me… lê em dizanin ku huner hertim xwedî roleke muxalif e û xizmeta gelê xwe dike. Dema ji bo êş û derdên civakê bibe derman digihêje armanca xwe. Lê hunera ku li pêşengehê derdixe pêşberî gel zêdetir bi rêya êş û derdê gel dike bin xizmeta xwe ya şexsî û ji bo çîneke elît dikeve xizmetê. Armanca hunerê lêgerina heqîqetê ye. Hunera ku di xizmeta gel de be hest û endîşeyên kurdan baş fêm dike û wan darbestên rengo rengo nîşanê gel nade. Ji ber ku mirin bi tu awayî li ba tu neteweyê rengo rengo nîne. Mirina 34 ciwanan ji ber bêderfetiyan ku mecbur mabûn bûbûn kolber piştre dewletê bi tu awayî cezayek li tu kesi ne biriye, çawa dibe rengo rengo tê pêşkeşkirin?

Hinek bi kelecaneke mezin berê xwe didin pêşengehê, çima bi kelecaniyek mezin berê xwe didinê ji ber ku xwedê giravî entelektuel, siyasetmedar û hunermendên navdar çûne tev li vekirina pêşangehê bûne û bi coşeke mezin beş bi beş jûrên bîrê vekirine. Çi vekirine beşa dayikên şemiyê vekirine ku divê entelektulên kurd xwedî lê derkevin ku dayîkên şemîyê nirxên kurdan e lê vê pirsê napirsin ku dema dibe nirx û bi paçikan li pêşengehê dibe berhemek herkes ji bo nirxên kurdan berê xwe dide pêşengehê.

Tişta îro ji bo gelê Amedê tê pêşkêşkirin ji derveyî heqiqetê ye û dixwazin bîra rastiya roboskê berevajî bikin. Heqiqet çi ye? Dayikên şemiyê ne ku Ahmet Guneştekîn ji destpêka dayikên şemiyê heta niha ji bo têkoşîna wan dayikan, li Qada Galatasarayê dema di bin zor û zextên dijwar de, di bin baran û seqemê de li hestiyên zarokên xwe digeriyan, li ku bû? Û ji bo wan dayikan rojekê daxuyaniyek dabû an wekî hunermendekî ku dibêje ez ê êşên kurdan bînim zimên, tiştek din kiribû? Dayikên Şemiyê hê jî li hestiyên zarokên xwe digerin û heta hin hunermendên tirk ên wek Sezen Aksû, Tarkan û hwd. ji bo Dayikên Şemiyê stran çêkirin.

Heqîqet alfabeya winda nîn e alfabeya kurdî ye û bi milyonan kurd îro vê alfabeyê bi kar tînin û xwedî li zimanê xwe derdikevin û ‘î, x, w, q,’ yê jî bi kar tînin. Heqîqet ‘Girê Bîra’ ku kurd îro bi arşîvên xurt xwedî li windabûyên xwe û nirxên xwe derdikevin. Heqîqet rastiya berxwedana Zîndana Amedê ye ku îro bi milyonan kurd vejandine. Heqîqet rizandina hunermendên ku ji bo berjewendiyên xwe nirxên gel bi kartînin nîne. Heqîqet ew e ku dema êrîşên li ser kurdan pêk hatin, hun tunebûn. Erê gelê kurd ji hunermendên wek Ahmet Guneştekîn re dibêje hun tu demê tunebûn û hunera we ne li pişta me bû.

Ez tenê wek kurdekê vê tiştê dipirsim; gelo samîmiyet û jidilî di ku dera vê pêşengehê de heye?



Mahmut Bozarslan (VOA Türkish)

xwebûn

25-31 Cotmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 97

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Elif Can Alkan
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Kurdên cîhana dêrîn; Hattî-Hîttî 8



Keştiya Alalû
Agît Yazar



....Qasid Hattûşazîtî, bi nameyeke gilîbarkirî ya ji hêla Keybanû Ankhesenemon ve hatibû şandin, vedigere. Keybanû, di nameya duyem de hinekî îşkê gazinên xwe dijdîne û ji Keya Şûppîlûlîûma re wiha dibêje:

"Tu çima ji min bawer nake, dibêje 'min dixapîne' Ger kurekî min hebûya, min biçûkxistina xwe û welatê xwe wiha ji welatekî din re aşkere dikir? Te ji min bawer nekir û wiha ji min re nivîsandiye. Mêrê min mir. Lawê min jî tenê ye. Ez ê tu caran bi xizmetkarekî xwe re jî nezewicim. Min ji tu dewleteke din re jî nenivîsandiye, tenê va ji te re dibêjim. Têgotin gelek kurên te hene. Lawekî xwe bide min. Bila bibe mêrê min û li ser textê Misirê rûnê, bibe keya.

Li ser vê bersîva Keybanûya bî ya Misira bi hişmet, Keya Şûppîlûlîûma biryara xwe dide. Kurê xwe Mîrze Zananza, li gel yekîneyeke piçûk dişîne Misrê (balkêş e ku kurd hîn jî vî navî wekî 'zana' li zarokên xwe yên law dikin) Da ku bi Keybanû Ankhesenamun re bizewice.

Keya Şûppîlûlîûma bi kelecan, li ser derzîdanka niga li benda xebera xêrê dimîne. Lê mîrze Zananza li çola Sînayê, ji hêla xêrnexwazên Ankhesenamon ve tê kuştin. Ji şûna xebera xêrê, xebera reş a kuştina mîzreyê Hîtîtê, li welêt vedigere. Keya Şûppîlûlîûma, li ser vê xebera nebixêr har û hêç dibe; dibe xwê û dikeve agir. Gopalê keyatiyê yê di destê xwe de, sê caran li erdê dide û wiha dihîre: "Exiwû-welatî-misirrî!"

Ev hevoka li jor ya ji sê peyvan pêk tê, bi kurdiyeke xwerû tê bilêvkirin. Têgihştina van hersê peyvan, ne motacê wergerê ye. Lê dîsa jî ka em du gîsin(dubare) bikin: Exiwû wlatî Misirrî. Ango, li welatê Misirê bixînin! Piştî sê hezar û 400 sal şûn ve, peyv heman peyv, ziman heman ziman e.

Exiwû welatî Misirrî! Çiqas gotin zelal, ên ji kaniya kurdiya şîrîn diherikin. Nola kurdên me yên zaza dibêjin: pirodê paşa çînyo! (Lêxin keya tine)

Keya Şûppîlûlîûma, fermanê dide kurê xwe Ar-nûwanda yê keyayê Qarqamîşê, daku tola birayê xwe mîrze Zananza, ser bi ser ji Misiriyan bistîne.

Ar-nûwanda, artêşa xwe nola gurên sêbatê yên devbixwîn, li Misiriyan gurêx dike. Tevahiya baregehên Misriyan ên hêla bakûr, di ser wan de diruxwîne û wêran dike. Bi hezaran ji Misiriyan dîl digrin û berê wan dîlgirtiyan dide Hattûşa bi hişmet. Lê ev dîlên şerr yên Misirî, wêraniyê bi xwe re tînin û malikê li Împeretorîya Hîtîtê diverişînin. Lewra dîl, bi nexweşiya Webayê bûne. Hîna Hîtîtê şepa xwe ji êrişeke topyekûn re xweş dikir, da ku vê carê Misirê bi temamî zeft bike, lê xebera reş tê digihêje bereya şer ku xelkên Hitîtîstanê bi jana Webayê mehû bûne.

### Weba: Covîd 19 ya wê serdemê

Ev nexweşiya nebixêr, bi salan diajo. Zar zêç ên Hîtîtî, nola tûyên ji darê biweşin, wiha dikevin ser axa sar. Împaratora dêwasa dilolije û ji sax de dikeve. Goştê mirovan li ser hestî reş dibe û rêsî rêsî ji ser hestîyên wan tê xwarê. Zarok, sêwî dimînin. Ciwan, nîvqurmiçî dibin. Bûk û zavayên teze, dibelqitin. Çira malbatan ditefin.

Xezeba webayê li tu kesî hovenade. Heta Keya Şûppîlûlîûma jî bi Webayê dikeve. Ne tu hekîm, ne jî tu rimildar, tu kes nikarin dermanekî ji vî derdî re bibîne. Keya Şûppîlûlîûma, di çax û benga xwe ya herî xwurt de, bi vê nexweşiya xedar dimire. Stûna Împeratoriya Hîtîtê dişikê, konê wan tê xwarê. Fermandarê bi xof, Keya Şûppîlûlîûma yê zîrek yê ku bi şûran nedihat xwarê, Weba wî zîtî erdê dike û wî dişîne Warê Aşa.

Ar-nûvanda yê 2'em (B.Z. 1346 – 1345) derdikeve li ser textê bavê xwe Şûppîlûlîûma lê ew jî di heman salê de, bi heman şewbê dimire û ew jî derdikeve Warê Aşa. (Navê vî keyayê ciwan yê nîvqurmiçî, bi 'ar' destpêdike. (Min di xeleka berê de jî gotibû' Arnûwanda, navê çiyayekî pîroz yê kurdistanê ye) Navê mêran yê bi 'ar' dest pê dike, bi awayekî berbelav di nava kurdan de hatiye karanîn. Kurdên cîhana dêrîn jî û kurdên dema niha jî, vî navî bikaranîne, bikartînin. Çawa navê keyayekî eyan yê Xaltî/Ûrartû Ar-geştî bû, dema niha jî kurd navê zarokên xwe yên kur, datînin Ar-ges û hwd...)

Ji hêlekê de keya û mîrzeyên welîaht li dû hev dimirin, li aliyê din jî Covîd 19 ya wê serdemê, weba ya kujer bi hemû hêz û hêla xwe belav dibe û nola gundorekî digindire li ser xelkên Hîtîtê. Piştî kuştina mîrze Zananza, Keyayê Şûppîlûlîûma yê gewre û mîrze Ar-nûwanda jî dimirin.

Barê Împeratorîya dêwasa dimîne li ser pişta mîrze Murşîlî yê şanzde salî. Hattûşîlî, li pişta pênç birayan, yê herî piçûk e. Her du birayê Murşîlî yên din, yek mîrê Qarqamişê ye, yek jî mîrê Halpa, ango Helebê ye.

Wer tê famkirin, piştî mirina bav û birayan ya bêwext, Cimata Pankûyê tavilkê mîrze Murşîlî yê ku hîn kuryên simbêlên wî xwêdan nedabû, derdixînin li ser textê keyatiyê. Digel bobelatên mezin, bûyer û nexweşiya nebixêr lê dîsa jî Împeratora Hîtîtan nalukume û pergala dewletê birêkûpêk, nola saeta zêrîn dixebite. Mîrze Murşîlî yê xortik, zend û bendan vedimale û ji hemû bobelatên nebixêr re, dibêje qaqibixo!

### Keyayê êşên giran: Murşîliyê duyem

Murşîlî yê 2'em (B.Z. 1345 – 1315) derdikeve ser text. Nexweşiya webayê bi tevahiya hêz û hêla xwe ya dilguvêş didome. Weba, nola ewrekî reş barana mirinê li ser welêt dibarîne. Malbat tune dibin, hêlînên wan lê diherimin, kundên kor li şûna warên wêran dixwînin. (Nola dibêjin; nav î giran e, war î wêran e!)

Murşîlî yê xortik, bi hekîman dişêwire. Li fahla teyrikan vedinhêre. Rimilbaz rimilên xwe davêjin hewa. Li falên pîresêran dinere. Gaziya xwe digihîne Xeybanînasan(kahînan). Li gorî gotinên gotinbêjan, xwedê giravî kehanet dibêjin sersebebê vê xezebê, Şûppîlûlîûma yê bavê Murşîlî ye. Lewra ji bo textê keyatiyê, xwîn rijand û bû kujerê birayê xwe Tûthaliya. Bi vî awayî nistiya fermana pêşiyan betal kir. Ev bobelatên diqewimin jî, dikin bela wî. Lewra Keya Şûppîlûlîûma, fermana Telîpînû binpêkiribû. Loma jî, Xeybaniyan ango Kahînan gotibûn, ev bela wî ye ku Xweda li me hat xezebê.

Keya Murşîlî, li ber bîrdariya Yezdanê Bahozê yê Ezmanan temene dibe û jê lava dike. Da ku vê bela nebixêr, vê nexweşîya bêyom ji ser wan rake. Paşê xwe davêje tor û bextê Xwedawenda Rojê ya Arînayê. Li ber Xwedawendê çong vedide û bi berger, stuyê xwe li ber xwar dike. Di riya Xwedayan, Xwedawendeyan de goriyan jêre nezir dike. Keya Murşîlî yê xortik çer jî dike, tewşe; carekê kabûsê webaya nebixêr, kumişîye ser wan û wan yeko yeko dişînin dinya wiyalî.

Di neh saliya keyatiya Murşîlî de, xeberek din a reş ji wî re tê; birayê wî yê Mîrê Helebê jî bi nexweşiya Webayê miriye. Piştî wexteke kurt, xebera mirina birayê wî yê din yê Mîrê Qarqamîşê jî digihêje paytext Hattûşaya xopan. Murşîliyê piçûkê bira, dimîne bê pal û bê pişt; her çar birayên wî yên mezin ji pişta wî diçin. Nola evqas bobelat ne bes bin, jina wî Gaşşûlaviya jî bi heman nexweşiyê dikeve. Ji bo hevjîna wî ji nava lepê vê nexweşiya xedar pak bibe, pir li ber canê xwe dide lê hemû hewldanên wî tewş derdikevin. Hevriya wî ya jiyanê, Gaşşûlavya jî serê xwe davêje diyarê qebrê, axa kendalê gorê.

Murşîlî yê ciwan, dîsa xwe davêje tor û bextê xweda û xwedawendan lê vê carê bi rêbazeke gefxwurane li ber xweda xwedawendan digere û dibêje: "Xwedano! Ma we hay ji xwe henin hûn çi dikin? We ne şivan û gavan, we ne cotkarî û palevan, ne jî nanpêjek bi me ve hişt. Heke hûn vê xezebê ji ser me ranekin, ma ew ê êdî kî ji we re goriyan serjêbikin û xwarinên bi çêj ji we re pêşkêş bikin?"

Piştî salekê hevjîna wî Gaşşûlaviya jî, Murşîlî diterikîne û derdikeve Warê Aşa. Murşîlî, di derbarê mirina Gaşşûlavîya de, li dêmarîya xwe Tavanana ya Babîbîlî dikeve şikê û wê wekî pîrebokeke pîresêr gunehbar dike. Paşê jî wê ji meqamê 'şivanzanî' yê dadixîne û wê sergum dike. (Şivanzannî, erkeke taybet a Tawanannatîyê ye) Lewra delîlên Tawananna, sêhr li Keybanû Gaşşûlaviya kiribû lêhatibû piştrastkirn. Ev tewaneke berdêla wê kuştin bû. Dîsa jî Keya Murşîlî serwext tevdigere û wê nakuje.

Keya Murşîlî dibêje: "Min ew nekuşt. Niha ew bi çavên serê xwe Xwedayê Bahozê yê Ezmanan dibîne. Min malek da wê. Bi qasî debara xwe bike min mal da wê. Niha nan û avê wê heye"

Ev tehamula Murşîlî, mezinatiya wî bi me dide selimandin. Meriv çiqas wesfê vî merdemêrî bide, dîsa jî têrê nake.

Nola dibêjin: carekê çerxa felelê lê hatiye xezebê û aşê wî çep dizîvir e. Tu dibêje qey ew qas êşên giran ne bes e, di ser de jî, ji her çar hêlan de dijminê wan ên korfersend dajon ser Keya Murşîlî. Heta tinazên xwe bi Murşîlî dikin. Nameyên kêfqewitandinê jêre dişînin.

Murşîlî dibêje: "Ji min re digotin, tu tifalekî dera hanê ye. Ma qey çi tiştê te heye. Artêşa bavê te hebû. Leşker û erebokên wî yên hespan hebûn. Le yên te? Yên te çi henin rebeno!"

Lê ev Murşîlî yê kurê Şûppîlûlîûma yê pêlewan e; çêleşêrekî ji pişta şêra ye. Murşîlî, xwediyên van tinazên li jorê, wan li heftê û heft bavên wan poşman dikin. Neh salên salwext bi wan re têtekoşe. Mîregiyên li ber wî radibin, wan yeko yeko mutuh dikin, cardin wan bi Cimeta Pankûyê ve girêdidin. Nexasim derbên xedar li Kaşkayî û Arzewayîyan dixîne.

Keya Murşîlî, dajo li ser Keya Ûhhazîtî yê Arzewayî. Berê wî li paytexta bi hişmeta, paytex Apaşa/Efesos ango Efesa îro ye. Lê belê di rê de tiştekî seyr diqewime. Keya Murşîlî diqutife; devê wî dikeve tev; ji tirsan re ziman di dev de dibe lepeke goşt û nalive. Li hêla din Keyayê Arzewa, Keya Ûhhazîtî jî ji tirsan ta digire û dikeve nav nivîna...

***(dê bidome)***